

Di 75 salan de 75 hezar girtî hatin afirandin

Pêwîstî bi efûya giştî heye

D i 75 saliya komara
tirk û 50 saliya
Danezana Mafêن
Mirovan a Gerdûnî de
İHD efûyeke giştî û
bêcûdaftî anî rojevê. Ji
bo vê mebestê ji
demeke dirêj ve kam-
panyaya îmzeyê daye
destpêkirin. Rayedarên
dewletê jî bi
daxuyaniya DSP'ê
beşdarî vê nîqaşê bûn.
Lê ew mijarê bi aliyekî
din ve dikişînin.
Dixwazin efûyê bi gir-
tiyên adlî sînor bikin.

R 3




Ji Binxetê firyadeke libevdayî Helbestvan Fetulla Huseynî:

Em li xwe digerin, di nava
dûmana windabûnê de

R 8-9

İHD'ê roja 23'ê tîrme-
hê li ber Girtîgeha
Paşakapısı daxuyaniyek
da. Di daxuyaniyê de
wiha hate gotin: "Di
75 saliya komarê de jî
hê me komareke
demokratîk neafi-
randiye. Binesaziya
civakî, qedexe, tabû,
birçîbûn û newekhe-
viyan bi xwe re sûc û
sûcdar afirandine."



Şîrove: Awka dola teqayî linciya vindariyena – Rûpel 15

Şehîd: Nameyek vekirî ji dayikan re – Rûpel 6

Zarokên Amedê: 'Tatîl ji bo me pir-xebat e' – Rûpel 16


Dadmendî: Yasa û fêrîn din – Rûpel 4

Nejdet Buldan: Bela dîrokî rpl.5

Celalettin Yöyler: Kusî û meymûn, wawik û şêr rpl.13

Serkan Brûsk: Erdhejê qels kûrtir kir rpl.7

Lerzan Jandîl: Yewbiyene ser ro rpl.11



SAMİ TAN

Ev karsaz naxwazin tê bigi-hêjin ku, li cihê ku lê MED-TV hebe, kes berê xwe nade XAP-TV'ye. Dîsa ew newêrin rawestandina ser bikin. Lewre jî dibêjin: "PKK têk çûye."

Di kurdî de biwêjek heye: "Boça (terî) kerê ye, ne dirêj dibe ne jî kurt." Ev peyv ji bo tişte ku tê de pêşketin çenabe, tê bikaranîn. Mirov dikare rewşa Komara Tirk a 75 salan bişibîne boça kerê. Boça kerê, li gorî 75 sal berî niha hinekî dirêj bûye, lê dema mirov rewşa wê bi welatên din re hevrû bike, ji berê kurtir bûye. Lewre welatên din di nava şer û pevcûnên giran re derbas bûne, lê dîsa ji bûne hêzên împeryalist.

Dewleta tirk ji bilî şerê Kîbris û Kurdistanê neketiye nav şerekî mezin, dîsa ji hê wekî nîv-mêtîngîha dewleta Amerîkayê tê binavkirin. Xuya ye ku rayedarên tirk ji bi vê rewşê dizanîn, lewre ji filmê reklamê amade dîkin û bi honya 75 saliya komarê pesnê xwe didin. Dî vi filmê navborî de xewna xwe tînin zimên û Ameda pişî sala du hezâri nîşan didin û dibêjin bûye navenda bazirganiya Rojhilata Navîn. Rast e, dê ew xewn pêk were, lê ne di bin desthilatdarya wan de.

Van rojan 75 sal di ser Peymana Lozanê re derbas dîbin. Wekî tê zanîn dewleta tirk bi vê peymanê gîhîş sinorê xwe yên iroyîn. Lî iro dînya rewabûna vê peymanê nîqas dike. Edî rayedarên dewletê nikarin ji bo pîrozki-rina girêdana vê peymanê destûrê ji rayedarên Swîsreyê bistînin. Li aliyê din kurd bi beşdariya partî û şexsiyeten navdar konferanseke navneteweyî li dar dixin. Ev yek ji kambaxiya rewşa dewleta tirk nîşan dide.

Tevî van tiştan ji, rayedarên tirk ji ya xwe nayêñ xwarê, xwe nadîn ber çareseriyeke aştiyane. Kesênu ku xwe nêzî çareseriyeke sexte dîkin ji, dîbin hedefa tîren şovenîzmê. Bo nimûne roja 22'ye mehî di rojnameya Milleyetê de nûçeyek li ser rapora hin karsazên tirk hate weşandin. Li gorî vê rapore dê kurd karîbin di dibistanê taybet de bi kurdî ji perwerdehîyê bikin, di Televîzyona GAP'ê (belkî rastir e ku mirov bîbêje XAP-TV) de dê bernamayê bi kurdî karîbin bêñ weşandin. Ev karsaz naxwazin tê bigîhêjin ku kurd ew maf-

jixwe bi dest xistine, li cihê ku lê MED-TV hebe, kes berê xwe nade XAP-TV'ye. Dîsa ew newêrin behsa rawestandina ser bikin. Lewre jî dibêjin: "PKK têk çûye." Wekî ku dibêjin "Şahidê rovî boça rovî ye." Şahidê wan jî xapemeniya tirk e. Lî li gorî nûçeyen hefteyekê yên xapemeniyê ji di nava hefteyekê de bi dehan kes di ser hatine kuştin. Sistema cerdevaniya dipeliş, cerdevan li pey hev çekîn dewletê lê vedigerînin.

Ji ber ku rayedarên dewletê nikarin xwe bidin ber barê çareseriyeke durist, ji bo ku rî li ber gesbûna tevgera kurdan bigirin dest davêjin terorê. Bo nimûne hefteyekê cuvî li Amêdê du belavkarê rojnameya me hatin binçavkirin, di bin çav de işkence li wan hate kirin û ew bi kuştiné hatin tehdîtkirin. Her wiha ji hêzén dewletê 22 milyon pereyê wan û rojnameyê di dest wan desteser kirin. Li metropolan ji heman tişt tê serê xebatkar û belavkarê rojnameya me, lê ev tişt nikarin rî li ber gesbûna xebata Azadiya Welat bigirin.

Tirs

BRÜSK ARJÎN

Di her warî de mirov dikare bêjê ku 'tirs' rista xwe bêqîsûr dilîze. Bandoreke hêjayî pesndayinê ye ku li hest û giyanê kes(ên) li dijî xwe dike û xwe dike parçeyek ji kana mêtî û di nava mêtî de cihê xwe qewin vedikole.

Tirs, bi du azîneyan bandora xwe li ser mirovan dihêle. Yek erêniye û yek ji neyînî. Mirov heye ne ideolojîk û polîtîk e û bi ideolojiya hemdem xwe nexemîlandiye. Dema şerê maftîr ê gel û hêza dagirker rû dide, helbet ew ji para xwe ji zîlû zo-ra dagirker hildide ku xwezaya wî tê tarûmarkirin û li ser dawîyê koçberî metropolan biyânî dibe, zû bi zû ji rastiya xwe direve, dixwaze ew gundênil hil-weişiyayî qîz û bûkêñ bi destê zorê canê wan qirêjbûyî û wê trajediya li ser wî/wê bûye ji bîr bike. Çavên xwe digire û xwe radestî însafa hembêza sazûmana serdest dike. Bêguman ev kiryar ne ku bi xwestina dilê wî/wê, berevajî vê yekê, ji tirsê pêk tê. Bi hêla xwe ya din, tirs bandoreke erêni li ser mirovan diafirîne. Dihêle ku ew xwe bigîhîjîne rîzana mirovîn hemdem û pêşverû. Li welatên mêtîngî, mînak Kurdistan, ji bo mirov ji rastiya xwe hayîdar nebe, mêtîngî mirov di nav jiyanekî qedexe de digire û

her heyamê, ci rasterast ci nerast-rast, azîneyeke hovane li ser bikar tîne. Her ku mirov xwenas û jîr, şûrê zilmê li ser canê xwe dibîne û canê wî jan dide, tovê ramana tije rîk û armancıa tolhildanê, di nava bîra mêtîyê wî de hêşîn dibe. Ev yek ji dihêle ku mirov zêdetirîn bi xwendînê û ci cure çalakiyên din li rastiya xwe bigere. (Mînak, ez kî me, ji ku hatime, wela-

Her ku mirov xwenas, şûrê zilmê li ser canê xwe dibîne, tovê ramana tolhildanê, di nava mêtîyê wî/wê de hêşîn dibe. Ev yek ji dihêle ku mirov zêdetirîn li rastiya xwe bigere. (Mînak, ez kî me, ji ku hatime û hwd)

tê min ka û hwd) Belê, mirov ji bo başebaş rastiya xwe binase, zêdetirîn xwendîn û vekolîn pêwîst e. Ji ber vê egerê mirov bi riyêñ nepenî ji binî de, dest bi lêgerîn û lêkolîna rastiya kesayetiya xwe dike.

Wekî di jorîn de jî hate gotin, ji bo rastiya mirov, rastiya welatê mirov qedexe ye, mirov neçar dimîne ku bi riyêñ dizî, lê bi fedakariyeke hêja, bide pey şop û rîcâ rastiya xwe û têbikoşe. Bêşik di pêvajoya lêkolîn û têkoşîn de, tirsek mezin a mêtîngî her di nava hinavê mirov de ye.

Lê ev ji dibe sedem ku zewq û evîne-ke mezin bi mirov re biafire û mirov hêbehîtîn ber bi rastiya xwe ve bibeze. Pişti mirov gîhîş merhaleya rîzânî û xwe nas kir edî tirs, dikeve xizmeta meşa ber bi azadiyê de û tenê ji bo gîhîştina vê armancê kar dike. Carcaran, tirs; risteke xwe yî neyînî ji di vê pêvajoyê de dilîze. Bi giştî xwendevan û nivîskar, bi taybeti ji

nivîskar zerareke zor xirab ji tirsê-hildide. Niha ji ez mînakekî li ser rastiya xwe bidim. Bi rastî li Kurdistanê û li Tirkîciyeyê mîna her xwendevane-kî kurd min di mercen têrxirab û di bin tirseke mezin de xwendîna xwe ya bi zimanî zîkmakî û siyasi bi rî ve bir û berdewam kir. Li Kurdistanê di qul û binê erdê de gelek nîvis, helbest û pirtûkîn min veşartî ne. Ka rizîne, mişkan xwariye, li ber lehiyan çûye kes nizane. Lî ci eş e ku, iro ji xwendîn û nivîsandina xwe min di jor de jî anî zimên, bi vê tirsê, ez berdewam dikim. Belê ev yek ji ev in, zewq û heyecanê dide mirov. Lî bandoreke neyînî ji li ser mirov dihêle. Bo nimûne dema mirov nivîsen xwe dinivise, ji bo bandora tîrsa ha dijmin ê biavêje ser malê û hemû nivîs û berheman ewê dest deyneye ser û hemû keda mirov wê têk biçe. Ji ber vê yekê mirov neçar dimîne ku wan di qulan de binepîne.

Ferhengok

ajotkar: şoför
ayende: pêseroj
avzélélk: pelqaz (yucütaki baloncuk)
Bigerxistin: xebitandin.

Biso: bênhâ poten kû tê şewitandin
carûk: bêrika tozê ya navmalê

çexs:

dagêşîn: pêyabûn
deydik: hêlekan

dibistanêñ mecanî:

yatîli okul

delavşok: hemam

elende: berbang

gesbînî: xwesbînî (iyîmser)

hejar: belengaz, feqîr

hîm: bingeh

kîls: kîrc

kişwer: diyar; iklim

kônoz: serberdayî

mesîk: guher, mîrg

posimk: xizêm

qerd: siûd, şans

qalik: qaşîl

rîk: gir, kîn

sêxîl: kerîya berxikan

sêleh: xiz, qûm

sênder: erda rast
sîsotk: mîwîja reş; cureyekî bîrovê
sêleh: xiz, qûm
serşok: banyo
sêwilk: şerbik
şorkirin: axaftin
tîrsnak: xeternak, bi talûke
talan: komika devîyan
term: cendek, meyt
werrîfîn: jîqudumketin
xirî: benîştê dara behîvê
xîşk: xêz
xesîfîn: rûxîn, pelîşin
xiriqandin: kaşkirin
xêlkirin: govend gerandin
vehêşîn: bêhnvedan
vepirîkîn: peritandin
zimbîfîş: balgîva nîvîn

Di 75 salan de 75 hezar girtî hatin afirandin Pêwîstî bi efûya giştî heye

Di daxuyaniya ku ji bo kampanyayê hatiye belavkirin de ev tişt hatine gotin: "Di 75 saliya komarê de jî hê me komareke demokratik neafirandiye. Binesaziya civakî, qedexe, tabû, birçibûn û newekheviyan bi xwe re súc û súcdar afirandine, lewre jî girtîgeh tijî bûne. Hejmara girtiyan iro gihîstiye 75 hezaran."

Li ser deh saliya daxuyandina komara tirk de sirûdek hatibû amadekirin. Di vê sirûdê de wiha dihat gotin: "On yılda on milyon er yarattık (yanê me di deh salan de deh milyon serbaz afirand)" Hinekan ew gotin bi awa-yekî din rave dikir û digot: "On yılda on milyoner yarattık." ango me di deh salan deh milyoner afirandin. Di 75 saliya komara tirk gelek milyoner hatine afirandin, ji ber ku milyon daketiye radeya qurişan, lê digel jî li gorî istatistikên fermî di 75 salan de 75 hezar girtî hatine afirandin.

Vê rewşê berî her kesî bala Komeleya Mafêni Mirovan kişandiye û di 24'ê avrîla 1998'an de ji bo efûyeke giştî kampanyaya imzeyê dane destpêkirin. Endamên Komîsyona Efûyê ya İHD'ye ji bo gurkîrina dengê xwe her heftê li ber girtîgehekê daxuyaniya çapemeniyê didin. Kampanya li ber Girtîgeha Zarok û Jinan a Bakırköy û Zindana Metrisê daxuyaniye çapemeniyê hate dayîn. Roja 23'ê tîrmehê jî li ber Girtîgeha Paşakapısı daxuyanî hate dayîn.

Endamê Koma Efûyek Giştî û Bêcûdatî (Ayrımsız genel af çalışma grubu) dan zanîn kû heta iro sê hezar heb imze ketine destê wan. Endamên komê li ser kampanyayê ev agahî dan me: "Ev kampanyaya me wê bi awayekî berfirehî dom bike. Di demen pêş de emê daxuyaniyeke berfireh bidin. Em dikin efûyek bêcûdahî bixin rojevê. Di 75 saliya Komara Tirkîyeyê de û di 50 saliya morkirina Danezanâ Mafêni Mirovan a Gerdûnî de dewlet dev ji pêpeskirina mafêni mirovan bernâde. Hê jî ew mirovan diavîje hepsê, zindanan bi mirovan tije dike û Pirsgirêka kurdi çareser nake."

Di daxuyaniya ku ji bo kampanyayê hatiye belavkirin de ev tişt hatine gotin: "Di 75 saliya komarê de jî hê me komareke demokratik neafirandiye. Binesaziya civakî, qedexe, tabû, birçibûn û newekheviyan bi xwe re súc û súcdar afirandine, lewre jî girtîgeh tijî bûne. Hejmara girtiyan di sala 1990-91'ê de 20 hezar bûye, lê iro gihîstiye 75 hezaran. Di navbera salen 1981-1997'an de 183 kes di girtîgehan de jiyana xwe ji dest dane." Di daxuyaniya İHD'ê de tê gotin ku çareserkirina keseaya kurdi jî xwedîye ristekere sereke ye di zêdebûna hejmara girtiyan de. Li ser heman mijarê Komeleya Piştgiriya Girtiyan (TUHAD-DER) daxuyaniye belav kiriye. Di daxuniyeke Tuhad-derê de jî ev tişt hatine gotin: "Li Tirkîyeyê 641 ferîqe tunene, lê 641 girtîgeh hatine vekirin." Li gorî daxuyaniya



Tuhad-derê 60415 girtiyan adlı, 11.700 girtiyan siyasi hene, jî girtiyan siyasi 9 hezar û 5 kes ji doza PKK'ê ne. Li gorî heman daxuyaniye lêçûna girtîgeha ya mehekê 3 trilyon 245 milyar û 175 milyon lîrayen tirk digire.

Nîqaşa li ser efûyê bi gotinê Jina Serokê DSP'ê Bülent Ecevit, Rahsan Ecevit gur bû. Pişti ku Rahsan Ecevit got: "Di 75 saliya komarê de divê efûyek bê diyarkirin.", nîqaşa li nav qada dewletê jî belav bû. Li gorî wê divê bi vê efûyê girtiyan adlı û hinek rewşenbîren ku ji ber ramannen xwe di girtîgehê de ne bêñ berdan. Di nava rûpelên çapemeniya tirk de jî nîqaş û nûçeyen li ser vê mijarê bi berfirehî cih girtin. Lî piraniya rayedarên tirk dijberiya xwe li hemberî vê efûyê dan xuyakirin. Bi taybetî kesen di nav hikûmetê de diyar kirin ku ew nikarin kesen ku ji ber dîtinên xwe hatin girtin, berdin. Wan da zanîn ku bi tenê efûyek ji bo girtiyan adlı gengaz e. Girtiyan ji rêxistinên şoresser qet nehatin rojevê, lewre li gorî zagonên dewletê ew "terorist" bûn û ji bo effükirina wan guhartina qanûna bingehîn pêwîst e. Rêxistinên demokratik helwesteke tund li dijî vê nêzîktêdayîna derdorê nêzî dewletê dan û hate gotin ku divê dewlet dubendiyê nexe nava girtiyan û divê efûyeyeke giştî bê daxuyandin. İHD'ê li ser vê mijarê daxuyaniye da. Di vê daxuyaniye de tê gotin ku effuya qismî bersiva pêdiviyen civakê nadî û gelşen mezîn bi xwe re tîne. Lewre dubendiyê dixe nav-

bera girtiyan. Li aliyê din Tuhad-der di de zanîn ku efûya qismî dê bi kérî kesen mîna Engin Civan, Selim Edes û Halil Bezmen were. Di daxuyaniya Tuhad-der de tê gotin ku heke Ecevit ji dil bûya dê efûya giştî derxista, lê ew li pey hin destkeftinê siyasi ye.

Sungurlu navbertiya heyetan qedexe kir

Li aliyekî ev nîqaş têñ kirin, li aliyê din êrîşen li ser girtiyan siyasi didomin. Dewlet ji bo bicikirina sistema hucreyan karê xwe dimeşîne. Li hemberî vê yekê girtiyan siyasi jî berxwedanen xwe didomin. Lewre jî li girtîgehekê greva birçibûnê diqedede, li yeke din dest pê dike. Hin caran li çend girtîgehan bi hev re grevê birçibûnê didomin.

Di çareserkirina keseaya kurdi jî xwedîye ristekere sereke ye di zêdebûna hejmara girtiyan de. Li ser heman mijarê Komeleya Piştgiriya Girtiyan (TUHAD-DER) daxuyaniye belav kiriye. Di daxuniyeke Tuhad-derê de jî ev tişt hatine gotin: "Li Tirkîyeyê 641 ferîqe tunene, lê 641 girtîgeh hatine vekirin." Li gorî daxuyaniya

Kurtenûçe

Pirtûkxaneya Bedirxan, Pirtûkxaneya Kurdi ya yekemîn e li Suriyeyê. Ev pirtûkxaneya li bajare Helebê pirtûkên wêje û çanda kurdî belav dikir, bi biryara waliyê Helebê hate girtin. Xwediye wê helbestvan û nivískar M. Hemo ye. Wî di sala 1993'yan de digel hevalê xwe Elî Cefer pirtûkxaneya Xanî vekir û di sala 1994'an de ev pirtûkxane vekir. Ji vê hingê ve dewlat Suriyeyê li wî çavtengîyan dike; du caran M. Hemo hate girtin, çar caran pirtûkên wî hatin desteserkirin. Dîsa bi biryara Waliyê Helebê Mihemed Mîro Pir-tûkxaneya Bedirxan hate girtin.

Li gorî nûçeyeke ku roja 22'yê tîrmehê di rojnameya Milliyetê de derketiye, hinek nûnerên rêxistinên karsazan ên mîna Odeya Ba-zirganiyê ya Stenbolê, Weqfa Pêş-veçûna Aborî, Weqfa Lîkolînên Aborî û Civakî ya Tirkîyeyê ji bo çareseriya keseaya kurdî raporeke amade kirine. Di vê raporê de tê gotin ku divê li dibistanê arizî bi li bal tirkî bi kurdî jî hêvotin serbest be, li radyo û televîzyonên arizî bi kurdî weşan bê kirin. Di raporê de dîtinên fermî yê serê psîkolojîk hate dubarekirin, lewre jî qala rawestandina şer nehatiye kirin

Dadgeha Bilind biryara DGM'ya Stenbolê ya der barê Oral Çalîşlar de betal kir. Her çiqas parêzeran DGM'ê xwest ku li ser biryara berê sor bin jî, heyetê biryara ji nû ve darizandina Çalîşlar da. Oral Çalîşlar ji ber ku bi Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan û Serokê PSK'ê Kemal Burkay re hevpeyvîn kiribû DGM'ê cezaye pereyan li Çalîşlar birîbû, niha cezayê hepsê jê re tê xwestin. Mebûsê CHP'ê Ercan Karakaş, yê DSP'ê Ahmet Tan û Serokê TGC'ê Nail Güreli jî besdarî danişnâna ku roja 21'ê tîrmehê pêk hat bûn û piştevaniya xwe ji bo Çalîşlar diyar kir.

Li ser biryara ARGK'ê ya bazir-ganiya di navbera Başûr û Ba-kur de qedexe kiribû, hejmara kamyonê ku ji bo neftê diçin Başûr ji 1800 daket dora 800'. Li gorî daxuyaniye ARGK'ê heta niha hefta erebeyen ku guh nedane qedexyê hatine şewitandin. Di daxuyaniya ARGK'ê de dihat gotin ku dewleta tirk û PDK şerê li dijî gerîla bi pereyê neftê finanse dike. Nûçeyeke roja 23'yê tîrmehê di rojnameya Milliyetê de derket vê dîtinê diselmîne. Li gorî vê nûçeyê dewleta tirk şerî lîtreyê 10 milyon û 500 hezarî wekî bac distîne. PDK jî bedela mazota di depoyen yedek de wekî dolar distîne.

Yasa û fêrên din

Dadmendî bi yasayê ve bi rengekî xurt hatiye girêdan, ji ber ku dadmendî bêyi yasayan nayê pêango yasa merca pêkanîna dadmendiyê ya serekî ye û mîna ku "Justinian" dibêje: "Dadmendî ew e ku her mirov mafê xwe bistîne."

Yasa mîna ku hatiye nasandin, peywendiyê mirov û kişwer & sazûmanen gerînendî sev re yan, her yek cihê, bi rîdixe saz dike. Helbet ev rîxistina hanê di riya rîzanîne pendî û sizayan de ter pêkanîn. Lî belê yasazanîn fêreke berbixwe zor kevn e û têkiliya we nigel hemu besen fêrûlanîn heye.

I) Yasa û dadmendî

Dadmendî bi yasayê ve bi rengekî xurt hatiye girêdan, ji ber ku dadmendî bêyi yasayan nayê pêango yasa merca pêkanîna dadmendiyê ya serekî ye û mîna ku "Justinian"⁽¹⁾ dibêje: "Dadmendî ew e ku her mirov mafê xwe bistîne." Ji bo gel ew mafçı ne; yasa maneya wan mafan diyar dike û nakokiya di navbera berjewendiyê mirov û kişwer û civatê de çareser dike. Yasa tim dadmendiyê pêk nayine, ji ber ku pir xuhermend⁽²⁾ hene ku yasayan ji bo zordarî û sitemkariyê bi kar tînin. Pirî caran yasa li dijî dadmendiyê radiwesete.

1) Gava ku berjewendiyê milet bi ser a mirovan bikeve mîna civatên hevbeşayetiyê⁽³⁾.

2) Gava ku berjewendiya mirov kî yan hin mirovên "Xudkar"⁽⁴⁾ bi ser ya milet bikeve; mîna civatên diktatorî

2) Yasa û Sincî⁽⁵⁾ (akar)

Rîzanîn ku dihêlin mirov reftarê xwe bike û ji riya şas dûr bikeve û bi rengekî durist bi yên li dora xwe re bide û bistîne sincî ne û her wisa sincî bi yasayê ve girêdayî ye ji ber ku ew jî reftarekî pendî pêwîst dike lî belê rîzanîn sinciyê bêsiza ne û yêku pêk neyîne siza nayê pêsiya wî.

Nexwe her du yasa û sinc pêwîstiyen li mirov dikin, rîzanîn sinciyê tekûztir in, ji ber ku mirov ne ji tîrsa zewlînê⁽⁶⁾ pêk tîne, belê bi bawerî pêwîstê xwe pêktine.

3) Yasa û Fêrên Civakî yê din

Pêwendiyek lihevdanînkî di navbera yasa û van fêran de heye. Ji ber ku sazûmanen ku, vekolînen xwe li ser fêrên ramyarî û caborîzanî û civatzanînê çedikin, yasa û rista yasa-kî pêdivî dike û wan dike merceki

serekî.

a- Konevanzanîn (Fêrên ramyarî)⁽⁷⁾

Fêrên ramyariyê li gorî danasînên nûjen fêrên Xuhermendê ne, ji ber ku xuhermend di riya yasayê de desthilata xwe xurt dike. Ji ber ku yasa bê xuhermendê û

ke-
1 i -
jeke
rape-
randi-
nê nayê

Ji bo filozofê mezin ê yewnanî Aristoteles (84-322 Berî Isa) hemû çalakî ji bo pêkanîna armancekê ne. Armanca herî bilind a xweserî mirovan e û ev armanca bi tu awayî nabe haceta armanceke din e. Li nik wî, mirov ajaleke siyâsî ye û siyaset jî xebata serwerkirina dadmendiyê ye.

pêkanîn, lew her du fêr bi hev ve girêdayî ne û berî niha cudahî di navbera herduyan de tunebû lî roja îro her fêrekê qewareyek cihê ji xwe re bir.

Mînak: Pirtûka Aristo "Hemû konêvanî" tu têveliyê naxe navbera mafnas û kesê konevan û wisa jî ku Eflaton (Platon) li ser kişwera xwe dipeyive tiştek xuyanî nabe ku mafnas û xudkar pir cihê ne.

b- Aborîzanî: Ev fêr ji bo pêkanîna niyazîn mirovan yêşenber⁽⁸⁾ û danîna rîzanîn bazîrganî û berhemdariyê, hatiye danîn, lewma ev fêr cihekî mezin di nava yasayê de digire û pirî caran yasa li gorî rewşa civatê ya aborî tê danîn.

c-Civatzanîn: Civatzanîn guh li

reftarê mirov û civatê dike û hem jî van reftaran dinirxi-

ne, lê girêdana vê fêrê bi yasa ve wi-sa ye pir tiş-tîn ku yasa weki tawane dibîne civatê jî wisa dibîne, û pirî caran tawan-kar, ji ber rewşa civatê dike û tawa-n-kar, lewma ci-vatza-nîn bi yasa-yê v-e

pir
tê gi-
rêdan.

de dijiyan, saz bike, lewma ev yasa bû yasaya Împeratoriya Romanî heya bi sînoran.

Yasaya Şarevanî⁽¹⁰⁾: Ev yasa li ser rîzan û yasadânînê, bê ku guh li qewat û gerdiyê miletan bike, ava bûye û ev yasa pir li Fransayê tê bikaranîn û kişweren ku di bin desthilata Fransayê de bûn, ketin bin aka-ma vê yasayê mîna Sûriye û Lubnanê.

Yasaya İslâmî: Misilmantî behti-ri ji hemû olan guh li jiyana yasakî û pêwendîn yasakî kir, lewma rîzani-ne yasakî diyar kir û li peyrewêne xwe pêwîst kir ku di reftarê xwe de bidin pey wan rîzanan û ev rîzan di Quranê yan di peyvîn pêximber de hatine diyarkirin, lê piştî ku dem bi-hurî û kîşene nû hatin holê, ji bo çareserkirina van kîşeyan di rîyeke İslâmî de, hatin çekirin. Mîna İcmâi (rawejî û palan) û Qiyas (rûberkirin) ev yasa di kişwera islamî de heya bi sînoran belav bû, lê roja îro pir kêm kişwer bi vê yasayê dikin, tenê di hin kişweran de û di beşekî tenê ji beşen yasayê de vê yasayê bi kar tînin; mîna Sûriye yasa çilonayıya ke-sîti tenê ji misilmantî yê wer-girtiye û birêن yasayê yê din ji yasaya Ewropa û Fransaya biriye.

4-Yasa Gelempêri⁽¹¹⁾: Ev yasa û diyardeyên ku mafnasdan danîbûn û bi demê re bi pêş ve çûn û niha li Îngilistanê tê bikaranîn. Her wiha hemû mileten Englo-seksonî jî ev yasa bi kar dianîn. Zor nas kiriye ku yasa-ya Îngilistanê yasaya qewat⁽¹²⁾ û rabirda⁽¹³⁾ ye, anglo milet ji kevn de çi rîzan bi kar dianîn dibû yasa Qralge-ha Birîtanî, lewma navê wê yasayê kiribûn "Yasaya Îngilistanê ya Neni-vîskî"

Şîrovekirina peyvan :
1-Yasadanerekî Romanî

2-Hükümet

3-Sosyalîzm

4-Hakîm

5-Exlaq

6-Ceza

7-Siyasetzanîn

8-Malî

9-Bandor

10-Medenî


11-Genel

12-Orf û adet

13-Sabiqe

Dê bidome

Amedekar: HOZANÊ DILZAR



Rêzimanê kurmancî

SAMÎ BERBANG

Gihanek

Her wekî ji navê wê jî diyar e, gihanek bi serê ne xwediye tu wateyê ne, lê du hevokan bi hev ve girê dide, an jî peyvekê bi hevokekê ve girê dide. Bo nimûne, dema em dibêjin; "Elî û Evîn xwişk û birayê hev in." /Û/ li vê derê gihanek e û her du navan digihîne hev û din. Dîsa gava em dibêjin; "Elî çû mal, lê Zarife li bal xaltîka xwe ma." Îcar peyva /lê/ dibe gihanek û her du hevokan (Elî çû mal, Zafire li bal xaltîka xwe ma) digihîne hev, wan bi hev û de din ve dibestîne. Çend heb gihanekên sereke yên di kurmancî de ev in: Bes, bila, çawa... wisa jî, Her çend ... ew çend, çiqas ... ew qas, lewre, dibe ku, jî, heke na, nexwe, dema ku, heta ku, hew, mixabin, di ser de jî, ji ber ku, ka, ku, lê, lê belê, û, qet nebe, yan... yan jî, ango carinan, çi ... çi, hem ... hem jî û htd.

Ji bo zelalkirina mijarê mirov dikare van mînakân bide:

Tu çi bixwazî, ezê bidim te, bes tu zêde galegalê neke.

Tu here, bila ew li pey te were.

Ew çawa hatin, dê wisa jî vegerin.

Her çend zêde bin, dê ew çend kar bikin.

Zilanê xebat kir tu jî bixebite.

Divê tu zû vegere, heke na ezê giliye te bikim.

Dema tu çûyî, jî min re nameyan bişîne.

Ew çû malê, hew deng jê derket.

Min tu dîtî, lê mixabin te ez nedîtim.

Min telefonî te kir, dibe ku ji te re negotibin.

Wî li min xist di ser jî jî giliya min li mal bavê min kir.

Dayika min ji ber ku karê wê hebû nehat.

Wan agahî nedan me, lewre jî em ketin kemîna neyaran.

Hevalê ku hat, jî gundê me bû.

Te mala me xera kir, qet nebe êgir pê nexe.

Elî got divê tu ji vir dûr bikevî, nexwe ez dê bihatama serdana we.

Yan Zerîn an jî Ferzende divê bêñ alîkariya min.

Zilan ango Zeynep Kinaci xwediye ye-kemîn çalakiya xwefedayî ye.

Carinan ew té bal me, carinan jî em diçin serdana wan.

Çi Rizgo, çi jî birayê wî Hesen bi kérî tiştekî nayên.

Tu hem tiştekî nadî mirov, hem jî fortan dikî.

Baneşan

Mirov hestêne xwe yên germ û gur bi alîkariya baneşanan dide der. Ew hest dibe ku gir û kîn an jî kîfxweşîyeke ji dil be. Hin baneşan di binyata xwe da baneşan in mîna: Ax! Wax! Hey! Lo! Hey lo! Lî! Gelî cameran! Ey! Ox!, Oxwes! Hey wax! De! û htd.

Mirov dikare li ser van baneşanan van mînakân bide:

Ax dilo! Tu çima wiha li min dikî?

Wax kurê min wax! Kê li te wiha kiriye?

Hey lo hevalo! Tu teqez neçî wî gundiha!

Oxwes! Dijminen me rastî belayê hatîne.

Hey wax! Felekê te çima li me wiha kir?

Wî! Kurê min çima tu wiha dikî?

De! Em vegerin gundê xwe.

Ha ho! De werin li vê ecêba giran binêrin.

Of! Tu zanî ez çiqas tengav bûme?!

Hoş! Segê heram biseqite here ji vir!

Ço, ço! Kera reş bigîhêjin heval û hogiran.

Hindek peyvîn din jî dema bi dengekî bilind hate gotin, dibin baneşan. Ku-ro rabe? Xêr e te xwe li erdê dirêj kiri-

ye?

Bira wiha nabe! Divê em rabin ser xwe û têbikoşin.

Bavo zû were!

Gelî hevalan guh bidin min!

Xwedeyo mala te ava be!

Dayê tu neke nelezîne!

Di kurdî de navdêrên ku dibin baneşan hinek qertafan digirin. Qertafen ku ew digirin li gorî zayend û mîjêrê ji hev vediqetin. Navdêrên nêr qertafa /-o/ digirin, navdêrên mî /-ê/ û navdêrên pirjimar jî /-ino/ digirin. Bo nimûne dema em dibêjin; "Hevalê!" em qala hevaleke keç, dema dibêjin; "hevalo!" çeli hevalekî xort û dema em dibêjin; "hevalinol!" jî em çeli çend hevalan dikin. Bi şeweyekî din afirandina baneşanen pirjimar bi alîkariya peyva gelî û bi qertafa tewangê ya pirjimar çêdibe. Wekî mînak; "Gelî hevalan!".

Mînak:

Birako te çi zû xwe da dest!

Bavo wisa nabe!

Keko rabe! Mala te hilweşîya.

Lo dengbêjo, dengê xwe bilind bike!

Keçê! Te xêr e, tu çi ji me dixwazi?!

Hevalê! Delalê! eyî te xebat nameşe.

Birano dev ji xebatê bernedin!

Zarokino! Hûn hêviya me ne.

Gundino guh nedin çâş û nokeran!

Gelî hevalan zû em ji vir dûr bikevin!

Gelî karkeran! Roja giran û girîng hatîye.

Gelî aqlimandan! Aqilê xwe bidin serê xwe.

edî li hemû cîhanê tê zanîn. Li ser çareserkirina wê ji kêm an zêde xebat têne kirin. Kurd dixebeitin, bi leşkerî, siyasi û kulturi. Dostêne kurdan dixebeitin. Lî belê tenê bi awayekî dîplo-matîk. Bila tenê bi diplomasîye be jî, moraleke mezîn ve ji bo kurdan. İro rewş wisa ye. Ew dema bi leşkerî jî harîkariya kurdan hate kirin, serê azadiye bi dawî dibe.

Kengî kurd ji bo azadiya xwe gavekê diavêjin, li hemberî wê jî xebatê dijimin mezin dibin. Ji bo ku kurd neyên cem hev, ew siyasete dimeşînin. Di vê siyaseta xwe de armanca wan ya herî mezin dijiminahiya navbera kurdan e. Demên bîhûrî di hemû nakokîyan de hebûn. Kurdên elewi û kurdên sunni kirine dijiminê hev. Kurdên misilman jî ïnane hemberê hev. Gelên Kurdistanî wekî kurd, asûrî, ermenî û erek jî ji van fesadiyan pişkîn xwe wergirtine. Di van siyasetan de her dem dagirkeran kar kiriye. Yen xwedî zerar ji gelên Kurdistanê bûne.

Demên berê bi destê dewleta Osmaniyan dibistanek taybetî hatîbû vekirin. Navê wê Mektaba Eşîran (Aşiret Mektebleri) bû. Di vê dibistanê de fermandar û memûrên kurd ji bo dijiminahiya kurdan dihatine perwerdekirin. Ew dijiminahiya kurdan, ji bo bilindbûna berjew-endiyen Osmaniyan bû. Ü ev xebata Osmaniyan xebateke siyasi û kulturi bû.

Pâşê bi destê Sultan Abdulhamîd hêzên çekdar hatine sazkarin. Navê wan hêzan Alayıyên Hemîdî bû (Hamidiye Alayları). Ev hêz jî, ji bo dijiminahiya Kurdistaniyan bû. Xebateke leşkerî bû. Dema mirov lêkolînê li ser dîroka Kurdistanê


bike, Osmanî di her du xebatê xwe de jî bi ser ketine. Loma wê demê diyariyên Osmaniyan ku didane axayan zêr bûn. Reiseşîr an ji axa, di bin parastina dewleta Osmaniyan da dijiminahiya gelên xwe dikirin. Axa û reiseşîr mirovên bi rûmet û qedr û qîmet bûn. Yen dihatin kuştin gelê Kurdistanê bû.

Di serhîdanê demênu buhûrî da bêalîtî ji siyaseteke hindek eşîran bû. Wekî di herêmekê de çend eşîran serhîdanê neteweyî dikirin. Çend eşîr jî bi destê dewleta dagirker bêalî diman. Gelek ji wan jî bi rasterast alîkariya dewleta tîr dikirin. Ji bo kurdan di dema şerê azadiye de bêalîbûn jî alîkariya dijimin e. Wekî Şex Seîdê nemir gotibû: "Bêtîterî berterefî ye." Yanî kesen di şerê azadîye de bêalî bimînîn alîkariya dijiminê xwe dikin. Li hemberî súcdaran bêdeng man jî şirikatiya súcdarîtiyê ye. Cerdevaniya di dema Osmaniyan de, di şoreşa Başûr da navê xwe guhart. Di sala 1966'an de navê cerdevaniyê li Başûr bû cehşîti. Li hemberî tekoşîna Başûr qirîjiyeke gelekî mezin bû. Ew tişte leşkerên ereban nedîkarî, bi destêne kurdên cehş dihat pêk ïnandin. Cehşîti bûbû xencerek li ser dilê kurdan. Niha jî hêzên Başûr dema hev û du tawanbar dikin vê dîroka qirêj tînîn bîra xwe. Tişte ku navê wê cerdevanî û cehşîti be, kîrêt e. Eger bi kurdi, eger bi erebî.

Gelo cerdevaniya navê wê bi tîrkî be navê wê tê guhartin? Mijareke din an jî rojeke din em ê li ser îxaneta ku navê wê "korucu" ye bisokinin.

Bela dîrokî (1)

NEJDET BULDAN



Di dîroka Kurdistanê de netewetî û dijittiya netewetiye bi hev re dimeşin.

Ji demên berê heya niha ev e rastiya me ye. Mixabin rastiya me ye. Gelek rastiyan li dijî berjewendiyen wan in. Lî belê gel ji bo rastkirina wan xeletiyan dixebeitin. Di jiyanâ xwe de. Di şerê azadiya xwe de. Mirov dikare bibêje ku, dewlet ji rêverbertiya xwe de li ser vê mijarê disekinin.

Mijara me ya iro li ser cerdevaniyê ye. Bi gotina kurdî li ser cehşîtiye ye.

Çi ye cehşîti? Ji kengî ve ketiye nava civaka me? Çareseriya wê çi ye?

Bi piranî ji bo gelên bindest tê çi wateyê? Ji bo pêşveçünê ye? An ji bo paşvemanê ye? Ü gelek pîrsen din.

Gelê, gelê Kurd di nava şerê hebûn û tunebûnê de ye, bi hemû nirxên ve. Bi aborî, siyasi, civakî û kulturi. Bi dîrokî û leşkerî. Di bin zordesî û qirkirinê de ye.

Di bin koçberiyê û belavbûnê de ye. Pêwîst nîn e ku mirov careke din rewşa Kurdistanê bide ber çavén xwe. Loma ew rewşa kurdan,

Nameyek vekirî ji dayikan re

Dema hevalê min tê ba te, di ber xwe de dibêje: "Gelo dema ez xebera şahadeta kurê wê bidim, wê helwesta wê çawa be?" Hevalê min dest diavêje bêrika xwe û kurnameyekê derdixe. Berî ku bixwîne, li ser 15 Gelawêjê diaxive. Peyre jî kurtenameyê dixwîne: "Hevalê Ceng kurê Kurdistanê ye. Şehîdê Partiyê ye..." Hîna peyva heval di devê wî de bû; dayê dengê lîlandina te li ber guhê min ket.

Dayê merheba! Niha ez ji asoyen bilind, ji ezmanên Medya, ji ber peravênen rojê, ji te û hemû dayikên hevalen xwe re bi zimanê xwe û bi dengêkî bilind dibêjim merhaba ...

Dayê, baş guhê xwe bide min, ka ez ê di vê nameya xwe de ci bibêjim. Weki tu jî dizanî, ez di nav mercen pir dijwar de mezin bûm. Ez hîna heşt salî bûm, dijmin bavê min li ber çavê min da her derbeyan. Ew roj qet ji bîra min naçe. Em li dikanê bûn, dijmin bi ser dikana me de girt, hemû tiştên me tevlihev kîrin û dane nav piyên xwe. Min bazda, da ku ez haya malê pê bixim. Di rî de ez ketim nava xem û xeyalên dûvedirêj: "Bavê min birin, dibe ku bi salan di zîndanê de bimîne an jî wî bikujin. Ez û du bîra, penc xwişk û dayika min. Wê ki me xwedî bike?" Bi vî awayî ez gihiştîm devê derî.

Weki ku ez ji xewê hisyar bibim, min di ber xwe got: "Ma jî min pê ve ki heye ku kariibare malê bîke?" Min di heşt saliya xwe de, biryara berpirsiyariya neh kesan hilda ser milê xwe û ez ketim hundir. Dayê, tu wê rojê pir xemgîn bûyî. Dijminen hov, mal û alavên te tevlihev kiribûn, hîrsa te pir mezin bû. Lî tiştekî ku ji destê me bîhata tunebû. Dema min li nav çavê te dînihîrî, mîna neynikê hovîtiya dijmin di ruwê te de xuya dikir. Ez li ber te rûniştîm, min li ber dilê te da, dilê min pir bi te şewiti. Min destê xwe li stîyên te aland û wiha got: "Dayika min! Tu qet xema nexwî, qey ez ji ci re me? Bi soz, ji iro û şûn de hemû karê malê ez ê bikim."

Ez bawer im, min soza xwe bi cih anî. Ji wê rojê û şûn de min dest bi kar û xebatê kir. Ez karkerekî heşt salî bûm êdi. Dema serê sibehê ez diçûm dibistanê, min ji te re digot: "Dema ez ji dibistanê dageriyam, bila dewê min û qalibê cemedê amade be, da ku bibim li garajê bifiroşim." Ji wê rojê û şûn de min havînê dew û ava cemidî li garaja Eskîfê ya Elîhê (Batman) difîrot û zivistanê ji li aşxanê dixebeitim. Lî belê min gelek astengî û pêkutiya psikolojik ji destê polisan didit. Her roj wan ez dikirim der, ez dîsa diçûm. Kîn û hîrsa min li dijî wan roj bi roj mezintir dibû. Li aliye din dema ku her ji panzdeh rojan carkekî, ez diçûme serdana girtian, zîlm û sitemkariya ku dijminen hov, li ber çavên

min, li ber deriyê girtigehê li gelê me dikir, min bi çavên serê xwe didît, ew dilê min ê biçük roj bi roj tije hîrs û kîn dibû.

Malxwîtiya min du salan bi vî rengî berdewam kir. Pişti ku bavê min ji girtigehê derket, hinekî dilê min xweş bû; ji ber ku ew barê giran ji ser pişta min hatibû rakirin. Lî wê şabûna min pir berdewam nekir. Lewre dijmin êdi bela xwe ji me venedikir. Bavê min ji ber pêkutiya dijmin neçar ma û berê xwe da İzmîrê. Min ji neçarî dîsa berpirsariya xwe berdewam kir. Ji ber pêkutiya polî-

ra, divê ez hevalê xwe yî herî kedkar ango bavê xwe ji bir nekim. Di xwenas-kirina min de keda wî pir heye.

Sal 1992, heyva gulanê bû. Tê bîra te dayê. Em wê rojê bi malbatî çün seyranê. Ew roj, roja bîryardayînê bû. Min û xwişka xwe, destûr ji we xwest, ku em vegeerin Welêt. Bi rastî hûn jî bi vê fikra me pir kîfxweş bûn. We got: "Rast e, mafê we ji heye ku hûn herin cem dayîka xwe ya mezin, weki hemû neviyên wê, hûn jî wê hembêz bikin." Me bi kîf û coş, cara dawîn wêneyên xwe bi hev re kişandin. Her kesî nişana serkeftinê

we ya aborî pir nexweş bûye, ji ber vê yekê te, xwişk û bîrayen min ê biçük hil-dane û hûn çûne derdora Derya Reş, da ku bindeqa bidin hev. Min bihîst bavê min ji hatîye cem dayîka xwe ya mezin. Bi rastî min dixwest em hev bibînin. Lî nebû qismet.


Dema hevalê min tê li we dipirsin da ku we agahdar bikin, kesî li mal nabi-nin. Lî heval navnişana we digire û we li derdora Derya Reş li geliyekî dibîne. Lî rasthatineke pir mezin e, ew roj ji roja 15 Gelawêjê ye. Evarî dema hemû hevalen we ji ser kar vedigerin malê, tu

wan tevan kom dikî û ji bo pîroz-bahîya 15 Gelawêjê amadehiyê dikî. Hevalê min bi coşa te ya mezin pir kîfxweş dibe. Di dilê xwe de dibêje: "Ev dayik pir xwîngerm e, lê binêre, li vî welaî biyan dilê wê ji bo welêt çiqas bi germî dijene." Hevalê min di ber xwe de dibêje: "Gelo dema ez xebera şahadeta kurê wê bidimé, wê helwesta wê çawa bibe?" Hevalê min dest diavêje bêrika xwe û kurnameyekê derdixe. Berî ku bixwîne, li ser 15 Gelawêjê diaxive. Peyre jî kurtenameyê dixwine: "Hevalê Ceng kurê Kurdistanê ye. Şehîdê Partiyê ye..." Hîna peyva heval di devê wî de bû; dayê dengê lîlandina te li ber guhê min ket. Dayê bes e êdi. Ez dê bi çend peyvan dawî li nameya xwe bînim. Ger rojekî riya te bi Çola Badikan, riya ku ji Farqînê diçê bi aliye Gelyê Zorê ve, di naberna gun-dê Deyikan û Qirikan de, tu li benda rî rastî cendekekî werî, ku çavderxistî û poz û guh jekirî be; wer bizanibe, yê li wir razayî ne ez im. Li rojê binêre, li stérkan binêre, xwe bide bilindahiya çi-yayan. Ez li wê me. Ger te ez li asoyen bilind ne dîtim, baş bizanibe ku ez wê rojê li Farqînê kar dikim. Weki ku dîrok jî dizane; ev hezar sal in ku koşk û eyvanê Badê Kurê Dostlik ango serayen Medan hatine hilweşandin. Em niha lê dixebeitin ku ji nû ve ava bikin. Me niha dest bi avahiyê kiriye. Her roj kevirekî enîşkê em berdidin bingeh û esasen wê. Kils û çexsa wê em bi xwîna xwe distîren. Ji bo ku tu hêz û tu kes pê nikarin.

Her ku ez mezin dibûm, ew dengê xweş di guhê min de gurtir dibû. Hes-retek di dilê min de peyda bûbû. Roj bi roj kovana dilê min bêhtir dibû. Welatê biyaniyan li ber çavê min reş bûbû êdi. Min ji xwe dipirsî: "Ez kî me gelo? Ez li van deran ci dikim?" Bi rastî li vi-

kiribû. Peyre em tev rabûn dilanê. Eđî bîryar hatibû standin. Roj bi roj agirê dilê me germ dibû, di nav bê aramîyê de em li benda rojê bûn. Roja oxi-rê hatibû diyarkirin. Roja ku ji bo gelê kurd, bûbû destpêka zayînê ango mîlâtî. Ji ber ku heşt sal berê di 15 Gelawêjê de min di xewna xwe de dengê tifinga Egîdan bîhîstibû. Lewre ew roj bi zanebûn hatibû bijartin. Dema ku em bi rî ketin, ew tilîlî û çepikên we tu caran nayen jibîkîrin. Her ku têne bîra min coşa min zêde dibe. Çend astengî di rî de derketin pêşîya me lê vîna (îrade) me zora wan bir. Derabe û deriyê pola li ber germiya dilê me diheliya. Me xwe gîhand hembêza dayika dayikan.

Dayê ev pênc sal in ku em ji hev qetiyan. Min pir dixwest nameyekê ji te re bişînim; wê fedekarî û dilovanîya te tê de binîsim. Lî heya iro derfetên min çenebûbûn. Lî gorî saloxan rewşa



□ Tîrmeh 1994:

Ibrahim İncedursun û 20 hevalên wî sehid ketin

İbrâhim İncedursun, heta dibistana liseyê li Cewlikê dixwîne. Zanîngeha Teknikî va Şenvoile, Beşa Makînvê kuta dike. İncedursun Cigiriya Serokê Giştî vê HEP'ê kîriye. Piş re tevîl malbata xwe diçe Ewropayê û li wir bi cih dibe. Pişî xebata li derveyî welat, di dema xwe ya Brîtanayê de diçe akademîva şer. Di dawiya 1993'yan de jî diçe welat. Di tîrmeha 1994'an de, li Evaleta Amedê tevîl bîst rehevâlên xwe di şerekî de tevîl karwanê şehîdan dibe.

BÜYERINE JI DİROKÊ

□ 29 tîrmeh 1992:

Cetin Abayay hate qetilkirin

Nücegîhane Kovara Özgür Halkê Çetin Abayay li Batmanê ji aliye kontrgerîla ve hate qetilkirin. Hêzên tarî yên dewletê ji ber ku kîrînê wê yên li herêmê ji aliye raya giştî ve neyîn zanîn dest bi kuştina nûçevan û nûnerên roineme û kovarê kurdan kîrin. Yek ji van ourbanan jî nûçegîhanê Özgür Halkê Çetin Abayay e. Qatîlên Çetin Abayay hê jî nehatine girtin.

Panela bibîranîna Celadet Bedirxan: Hawar hê jî tê hawara me



Di panelê de birêvebirinâ H. Kaya, F. H. Sağrıç, Z. Farqînî û F. Dilges li ser jiyan gramer, rîzmanan û kesayetiya siyasi ya C. Bedirxan agahî dan.

Ji aliye Înstituya Kurdi ya Stenbolê ve di 19'ê tîrmehê de li NÇM'ya Stenbolê ji bo bîranîna Celadet Elî Bedirxan panelek hate lidarxistin.

Panel ji aliye Serokê Înstitûya Kurdi ya Stenbolê Hasan Kaya ve hate birêvebirin. F. Huseyn Sağrıç, Zana Farqînî û Felat Dilges jî wekî panelîst besdarî panelê bûn. Di axaftina vekirinâ de Hasan Kaya, li ser jiyan Celadet Bedirxan ev agahî dan: "Celadet ji bilî zimanê kurdi bi frensi, flemanî, îngilizî, tirkî, erekî jî dizanibû û gelek berhemên wî wekî Alfabeya Kurdi, Rêzimana Kurdi, Ferheng, Rêzimana Alfabeya Kurdi, Lawijen Êzîdiyan, Mektûbek ji Mustafa kermal re hafin weşandin. Digel van li ser Pirsgirêka Kurdi jî pirtûkeke wî hatîye weşandin." Li dûv vê axaftina destpêkê, Feqî Huseyn Sağrıç li ser "Rêzimana Celadet Bedirxan" bîr û ramânê xwe derbirin.

F. Huseyn li ser pirsa "Çima bi alfabeleya latînî" ev tişti ji Celadet Bedirxan veguhest: "Ez û gelek hevalên xwe em çûn Kurdistanê û gerîyan. Di gerîna xwe de wan bi zimanê xwe dinîvisand, min bi zimanê xwe dinîvisand. Gava wan nîvîsa xwe dixwend, hêsan dixwend, lê gava min nîvîsa xwe dixwend min gelek zehmetî dikişand. Min li wir biryar da ku pêdiviya zimanê kurdî bi alfebeya lafinî heye." F. Huseyn Sağrıç da zanîn ku Celadet di Hawarê de dest bi nîvîsandina bi alfebeya latînî kîriye. F. Huseyn wisa dom kir: "Celadet gramer jî nîvîsandiye û di warê gramerê de di rîza herî pêşîn de ye." F. Huseyn Sağrıç li ser hinek tiştên ku ew di xebatên Celadet Bedirxan de wekî qelsî dibîne jî rawestiya. Li gorî Sağrıç Celadet Bedirxan hinekî zêde di bin bandora rêzimana fransî de maye û di pirtûka xwe de zehf cih daye mînakän.

Li pey vê axaftinê Zana Farqînî "Li ser Rojnamegeriya Celadet" axîvî û wiha got: "Rojnamegeriya Kurdi bi malbata Celadet Bedirxan dest pê kîriye û Celadet Bedirxan jî ew bi pêş ve bîriye û her wiha C. Bedirxan zimanê çapemeniya bi kurdi jî afîrandiye." Farqînî diyar kir ku zimanê çapemeniye zimanekî taybet e, ne wekî zimanê axaftinê ye.

Zana Farqînî li ser zimanê Kovara Ronahîyê jî sekînî û da xuyand ku zimanê Kovara Ronahî, zimanê nûçeyan bûye. Rojnameger Zana Farqînî û da zanîn ku di dema destpêka rojnameya Welat de wan ji vê kovarê gelekî sûd wergirtiye. Wî got: "Îro jî Hawara Celadet Bedirxan digîhe Hawara gelek mirovên kurd."

Panelîstê dawîn Felat Dilges jî li ser "Kesayetiya Celadet a Siyasi" sekînî. Dilges, wisa dest bi axaftina xwe kir: "Aliye siyasi yê Celadet Bedirxan nayê zanîn, ew aliye wî di bin siya xebata wî ya zîmîn de maye." Felat Dilges got ku Celadet Bedirxan heta dimire li ser siyaseta kurd rola xwe dilîze. Bi boçûna Dilges, Celadet Bedirxan di siyasetê de realîzm diparast. Felat Dilges wisa dom kir: "Celadet Bedirxan ji biçûkiya xwe de dest bi siyasetê kîriye û di nav 'Jön Türk'an de cih girtiye. Dîsa Ew yek ji teorîsyenê tevgera 1927-1930'yî û rîexistina Xoybûnê ye û nasnameya xwe ya siyasi her û her diparêze."

Lêkolîner Dilges helwesta Celadet Bedirxan a pişî têkçûna tevgera siyasi a kurd wiha rave kir: "Celadet Bedirxan her çiqas di hejmara Hawar a yekemîn de dibêje 'Ev kovar çandî ye' jî, Hawar serdanpê siyasi bû û doza serxwebûna Kurdistanê dikir." Li gorî Felat Dilges, Celadet Bedirxan alîgirê pirdengiyê û demokrasiyê bû.

A. WELAT / STENBOL

ÇAVDÊRÎ

Erdhejê gelş
kûrtir kir

SERKAN BRUŞK

Carina bin cin û war ëi hawîr, avhewa, avahisazîya xwe û bi taybetî û bi danustancinê şenîyên xwe li ser jivana mirov rîc û *"...ben kûr cibêlin"*. Ev dever dikarin ne li welatê mirov jî bin. Dikarin li welatê cîran, yan jî li welatê kû bi sedan, bi hezaran km. ji welatê mirov dûr bin. Dema mirov ji van deveran dûr dikeye, mirov hinek bîranîn taybetî yên bedew ên van cihan jî bi xwe re dibe.

Jixwe dema mirov bi munasebetekê çi baş, çi jî nebaş navê van cihen şopkûr dibihiye hesten kûr ên bêrîkirinê û bîbîranînê bi mirov re peyda dîbin. Mirov tîra xwe radipêçin û di nav bandora xwe de dagir dîkin.

Ez li ser navê xwe bêjim bajarê Edenevê ye jî van bajarên ku herî zêde bandor li min kîriye ye. Vî bajarê ku dewlet alîkariyê bi kurdên koçberkirî re nake û pişta xwe dide wan. Dîsa destê dewletê yê alîkariyê ji bo hemû kurdên li bajarakên din dijin jî, em dibînin ku kin e û hetâ berevajîya vê, ev dest, li hemberî alîkarixwazên erdhejzade bêtolerans e. Belê Edene ye, ya ku em dê navê wê li vir bijîr bînin.

Beri niha bi çend hefteyan bi awayekî navber erdhejike mezin û di pey re jî yên biçûktir çebûbûn. Hin erdhejî bi talûke ne û hinek jî wan jî ne ewqas bi xeter in. Yê herî bi xeter jî ber şkestina fayan pêk tê. Ü ev jî zirareke mezin digihîne hawîrê. Welatê me jî li ser kembera erdheja Alpê ye ku yek ji xeterîntirin kembera cîhanê ye. Dema mirov erdhejên ku tenê li welatê me çêbûne bibîr tîne mirov bi asanî dikare vê encamê bibîne: Erzîngan, Gimgim, Çewlik û Lice.

Hela em bêjin welat û cîranwelatên me ne xwedîyê esaseki saxlem in. Zemîna wan wek deydi û hêlanê ye. Ev tiştekî ne di destê me de ye. Lî gelo mirov nikare milet ji ber xerebîyê vî him û rîknî biparêze?

Dema mirov li istatîstîkên ku li ser welatên ku herî zêde zîrâr ji erdhejî dîtine dinêre, mirov Mezrabota û Anatoliyê ku di istatîstîkan de wekî Tirkî têbînayîn, di rîza pêncan de dibîne. Ez bawer dikim vê erdheja dawî dê Tirkî çend pile bilintir bibire. Pişî erdheja ku tevgera rizgarîxwazî di qalikê dewleta tirk de çekiribû, dewletê jî ji bo pêşîya ricif û heja xwe bigire erdhejek qirêj û lewîti li hemberî kurdên sîvîl û destvala pêk anîbû. Bi hezaran gund şewitandin û bi sedan kes ronîviro li sûkan kuştibûn. Dukanê ku kepengen xwe ji bo protestokirina kîrînê kîrît ên dewletê dadixistin bûbûn hedefa panzerîn artêşê. Dewletê bi her awayî politîkaya xwe ya koçkirinê xistibû jiyanê. Bi hezaran malbatên welatparêz xwe li Edenevê girtibûn. Taxên ku kurd li wan dijiyan di nava çend salan de du caran heta sê caran li xwe mestir bûbûn.

Koçberan ji xwe re li gora derfetên xwe xanî lê kiribûn. Piraniya van xaniyan ji bo debara rojane ne, bi malzemeyen herî basît hatine avakirin. Ji ber vê jî malîn wan xwe li ber vê erdheja surîstê negirt. Bi gelemerpi wan ji vê zelzeleyê zîrâr dît û xesirin. Lî vê zelzeleyê hesta wan a li dijî dewletê jî hejand. Van hemwelatiyê me bi awayekî xurt hemû maqûlîn dewletê ricimandin; gotibûn baweriya me bi dewletê tune. Ev gotinên xwe di rûyê rayedaran de jî gotin. Bi kîn û nefreta xwe ya ku hîn jî gund bi xwe re anîbûn êrîşî ser erebeyen polisan kirin. Yek ji aliye herî balkêş ê vê bûyerê ev e ku navbera gelê kurd û dewletê baş vebûye û êdî gotinên wan û dewletê nema dikevin serê hev. Bila serê hemû kesen ku xîzmîn wan mîrine sax be.

Ji Binxetê firyadeke libevday

Em li xwe digerin, di na

Di nav du kevanan de helbest li bal Fethulla Huseynî ji haceta ji nebediyê re ava dibe. Tu sînor ji qorêne wê re nîn in. Lî dimîne azadî, revek ji tevnêne rastiya xwar, bal bi asîmanê xewnê ve, xewna ku tu carî meraman pêk nayîne û li gel van hemû bobelatên razî û eşkerekî dimîne pireke dirêj û bi sûde di navbera xewn û hişyariyê de.

JANA SEYDA/ BAŞURÊ BIÇÜK

We helbestên klasik û nûjen ji nivîsin. Kijan helbest, bêhtir nêzîkî hesten we bûn?

□ Nivîsandin, wekî şaxeke hunerî, girêdana wê bi pêşketinê re jixweber e. Nivîsandinek dahênanî bilind nîn e, bêyî nêzîkbûna şeweyê yekemîn. Bi gotineke din, ez dixwazim bibêjim ku besdariya guhartinê yek ji girîngitîrîn pêşkêsiya berhemê ye. Di dema guhartinên cîhanî û yên hawîrdor me li bin guhê hev dixînin. Geh li rojhilat in, geh li başûn in û wisa ji aliyan din jî ji me ne bêpar in. Tu dibêjî qey em li xwe digerin, di nava dûmana windabûn û toza xirecirê de.

Seba van tiştên jorîn, welatekî nexweser hewcedarî pesnekê bû, hewcedarî xemleke zérîn bû, ku em tim li bejna wê ye derbeder bikin. Jê re li çepka bidin, helbet bi germî, bi dengekî bilind bistîfîn. Xem nîn e kes lê guhdarî bike an na. Mîna tu bibêjî "em ev in, ev welat û êşa me ye", em şoreş in û welatê me meydaña şoreşan e. Helbestên min ên klasik kurdayefîyeke jibirkirî nû kir, bi hesten min ên li hevdayî, bi vîn û evîn, bi fehîtiya gelekî xembar û maye li derveyî çarçewenê benden yasayan. Ev hesten min in ango birînen rojane ne, ji êşê tanî bi êşê, ma ji bili wê ci heye?

Wisa ji helbestên min ên nûjen hatin mîna berdewamiyekê. Lî vê carê ne di çarçewine hazirkirî de. Karîbûn dûri xefkîn ku gotinê li angoyen xwe digerin herin û dawî ev jî hesten min in. Teñê dimînin karine xweşik di çaxê ku xweşikbûn ji hev dikeve, xwe eşkere di-kin, bêmebest û dîsan ji helbestên min ên klasik bingehêke ji derbasbûna min re di gerînaka toreyî de. Tevî ku gelek nizanîn bi vî şeweyî binivîsin û bi kêmanî dimîne bangewaziyeke sincirandina êşê rûbarî mirina rojane.

Hinek helbest hene zimanê wan pir hesan e û hinek ji ferhengî ne. Hûn çiqas ferhengê bi kar tînin di helbesta xwe de û li bal we avakirina helbestê cawa tê ?

□ Gelekî xweş e mirov azadiyê bide xwe, ligel kesen ku ev azadî nedane bejnîn me. Hilbijartina ziman, bendeke ni-


vîskarî û ramanî ye. Di baweriya min de, helbesta hêsan û ne hêsan tune, lê ya rastir, helbest û ne helbest heye. Mîna ku celebekê helbestê dibêje ez ev im, li ber çavên we raxistî me, werin gelî xwendevano/ yêjî jîr û yêjî bêmirwet min bixwînin, bêkoş. Li alîyê din jî bangek tê lê ne ji tevan re, ci gotinê bi kar têne kirin. Li bal min, ci ferhengî bin an na, gotinîne kurdî ne. Ji ber ku her rojê, bi kurdî, sed carî têne kuştin û qedexekirin. Ev bi xwe qamçiyekê bi zorê me davêje baxçeyê zimên. Ka cawa ez ê icar ferhengê bi kar bînim, wisa ji anîn-bûna helbestê ne danasîna tiştekî anîhayî ye û ne ji bo rastiya bûyerên rojane dibe. Ew ji vê çarçeweyê rizgar bûye, ji gava ku pela rojnameyê qut bû û zayina me winda bû, bêguneh. Di dema iro de behna helbest û siyanîdê bûne wekhev. Siyanîd milletê kurd dikuje bêhejmar û helbest janvanê xwe dikuje. Ji lewre ez ê cawa tiştekî ava bikim ew ê talî min bikuje. Di nav du kevanan de helbest li bal Fethulla Huseynî ji haceta ji nebediyê re ava dibe. Tu sînor ji qorêne wê re nîn in. Lî dimîne azadî, revek ji tevnêne rastiya xwar, bal bi asîmanê xewnê ve, xewna ku tu carî meraman pêk nayîne û ligel van hemû bobelatên razî û eşkerekî dimîne pireke dirêj û bi sûde di navbera xewn û hişyariyê de.

Demê ku hûn nivîsanda helbestê diqedînin, hûn pê nahesin ku we mafêne wê yên tevayî nedanê ?

□ Mafê helbestê bi xwe mîna xweşikbûna ruwê wê yî razî ye. Tu çiqas pesnê wê bidî hîna ji kêm e..! Ma gelo mafêne helbestê ci ne? Nû ciwanîya helbestê diyar dibe, di hilbijartina aheng û zimên de. Gava ez helbestekê dinivîsim, pê dihesim ku içarê wê şeytan li şûna melaiketan û perişan li şûna pêxemberan. rûnin Her tiştê hawîrdora min rast dibe. Li ser hesabê berevajîbûna ku bingehêke ji jiyana me re, ez ji xwêdana xwe didim, ji tiştê mayî ji vehesîyê û paşê ez dibim şana tilîyen xelkê û yasa-ya gerdûnê sêyemîn a ne pîroz li dora min vide; mirin, dînbûn, resbînî. Ji vê

xelekê ji nîrîn ji nîrînê cûda ye. Wekî tu bibêjî mafê helbestê ji mafê helbestvan e, ku ev ê paşî qedexekirî be, wê helbest çawa xwe bilivîne bêtess-kere û bênavnîşan û zemîn.

*Helbesta
klasik dûrî ya
nûjen e. Gelek
qonax di nav-
bera herdu-
wan de he-
ne. Dî-
wana
yekê*



"Kîşwera Şehîdan" klasik bû, lê ji niş-ke ve we şewaza nivîsandinâ xwe gu-
hart di dîwana duduwan de, "Fiyada Li
hevdayî bi Mizgîniya Reş". Cîma?

□ Helbestên "Kîşwera Şehîdan" di babet û şeweyen xwe de klasik bûn, lê nû bûn di gotin û raxistina xwe de. Ligel ku klasikîye bala min nekişand jî, min mîna bingehêke ji nivîsandinê re nivîsand. Qonaxeke sûda wê higê hebû. Ka bi min re bîstikekê birame, kuştin-gehek mîna Helepça volqaneke ahengî teqand. Hejeke ne surîşî bû di serbora milletê kurd de, yê ku ji sedê salan de di-

e ger tiştek mabe ji xwînê pişti xerdelê. Ma gelo ez dikarim bêqêrin ji dûr ve xwe li ber kîşwerekî wisa li dar bixim ?

Nûjeniya min ku di "Firyada li Hevdayî bi Mizgîniya Reş" de raxist, guhar-tinek bû di berdewamiyâ min de. Hate feryadeke li ser gelek rastiyen zuha ku her hêlén civaka nexweş dixemilînîn. Ji rûpela yekê de xwendevan, bi tenê, bîr dibe bê cawa reşî xwe li ser serê nijadekî jibirkirî vedigire. Dîrokê bi dizî "ew" beravêtî kiriye, gelek diktatoran tawan-nîn mezîn lê pêçane, ji gava ku cara yekemîn elendeya dîroka derewîn bejna

Helbestvan Fethulla Huseynî: a dûmana windabûnê de

xwe bi pêş de da. Helbet bêyî ku ev dîktatorên destbixwîn bêne kişandin berda-diya demê, eger ev dadî hebe, pişti van serpêhatiyen reş ma tiştek ji nişka ve heye? Dema tu rahêjî pêñûsê, windabûn diyar dibe, ku di çaxê iro de rengek e ji karekî şikestî re. Ji ber paşê kes me hembêz nake, di vê cihana biçük de, ji bilî fincana qehweyê û yareke kevn û keçikeke windayî û zarokekî dê windakirî. Ji bo danasînê, eger Cegerxwîn heyanî a niha sax bûya, wê helbesta nûjen nivîsandibûya.

Hûn helbesta kurdî, li Başûrê Biçûk çawa dibînin?

□ Li Başûrê Biçûk taybetiyeke helbesta kurdî ya herî xweşik, piraniya helbestavan bi du zimanan dinivîsinin; kurdî û erebî. Ev yek dihêle ku encûmaneke hunerî ya bilind peyda bibe ji têkîliya her du çandan. Di nîvê sedsala bîstan de Mamosta Cegerxwîn dest bi weşandina helbestê kurdî kir, bi alfâriya Mîr Celadet Bedirxan û besdariya Osman Sebrî yên ku hingê di kovara Hawarê de dixebeitin. Li gorî rastiya wan rojan Cegerxwîn bi zanabûna xwe yî olî û mîraniya xwe, ku mirovekî konevanî civaka kurdî ji xelkê re eşkere kir. Lewre berdewamiyek bi nivîsandinê wî re çêbû. Bi zimanekî sivik û naskirî durişmeyen kurdî di wêneyin helbestî de çarçew kir. Dîwanên Cegerxwîn yekemînê pirtûkan bûn bi zimanê kurdî. Me çavên xwe li ser vekir, ji wilô herkesê ku berê nivîsand dest bi helbestê kir, hetanî ku zemîneke fireh girt. A niha pêşketina wê xurt e, bi ziman û şewe û aheng û awayê xwe eşkerebûnê dide ber xwe. Iro navine bi deng û xameyine xurt peyda dibin. Helbet ev dûrfî durîşmeyê çend nivîskarê qels ku serên xwe li diwarên herî didin, ev ên ku di warê pexşane de didin û distînin, qelsbûneke diyarkirî di zimanê wan de peyda dibe. Ji vir de ya ku bêhtir navgirtî ye û bûye nîşaneke şaristanî, bi demî re dijî "helbest" e û ev ne tiştekî saltkirî ye. Belê asteke cihe xwe bi xurtî girtî ye û li ber xwe dane rûbarî pûçbûnê û çandayên biyan ku êrîşî mejiyê milletekî nexweser dikan.

Gelo tu bejnêن helbestî yên bilind di meydana helbesta kurdî de çêbûne..?

□ Çaxê ku Cegerxwîn dinivîsand hevreyen wî jî hebûn, mîna Namî, Palo, Bengî lê Cegerxwîn ji ber têkîliya wî bi siyaseta mîletê wî ve û gîrêdana wî bi ideolojiya wê çaxê re, hişt ku Cegerxwîn bi tenê di meydana nivîsandinê de bimîne. Bêguman xameya wî ya xurt û cegera bixwîn a wî jî roleke ne hêsan di

berdewamiya wê de lîstin. Anîha jî ev bobelat dîsan xuya dibe. Kesênu dibin siwarê tîrsê qet û qet nabin nivîskar, va ye iro "mîna te got" tevî pîrbûna navan û çapbûna dîwanan, tiştek dimîne "ka wê kî berdewam bike û kî yê destê xwe herdûyan hilde". Welatê me bi xwe bûkek e li ser dengê qerabalexê radizê û li ser dengê şer hişyar dibe, ev ji bilî tîbûna me ji nivîsandinê re ku bi xwe eşke-re li me binêre, dibîne ku em dijîn. Lî yê di paş perdan de "bi razî" li rewşa me binêre herifandina me beloq e, tu tiştekî gesbînî nîn e ku mirov xwe bide ali-yê wî, wisa welatê me helbesta me ye û helbesta me razâ me ye û Başûrê ku karîbû bejneke mîna Cegerxwîn û xwedâyekî mîna Selîm Berekat derîne, dikare bejnîne dîtir yên bilind jî derîne û ew hîna jineke nûciwan e.

Bêhtir çanda kurdî li Başûrê Biçûk mijara wê heye, di nêrîna we de çima?

□ Bi taybetî a niha çandeya kurdî li Başûrê Biçûk haleteke ji beravêtibûnê dijî. Ji nav hemû çandên hawîrdor ên kurdî û yên biyan, êsa wê êşeke herî "awarte ye" di nav koma çandan de. Ji hêla mijara xwe ve roleke nê hêsan di amadekirina ruwê çanda bilind de lîst. Ev jî vedigere ku piraniya nivîskarê "başûrî" bi nêrîneke panoramayî li kêşa çanda xwe dinihîrin û bi rengekî akade mîk dixebeitin, tevî ku destpêkirina xurtbûna wê ne ji zû de bû.

Ew bi xwe ji sala '1990' û vir de li ser destê çend rewşenbîrên belavbûyî bi kar hat. Mîna Ebdulbaqî Huseynî, Konê Reş, Ferhad Çelebî, Erdewanê Têmûr û Siyamend İbrahim... Van bi xwe karîbûn celebekî ji pêşxitina tevgera rojnamevanî li dar bixînîn û hiştin ku gelek nivîskarê kurd yên ku bi erebî jî dinîvîsin li xwe vejerin. Lî mixabin va ye dîsa çanda me "helbet di warê xweyî rojnamevanî de" paş de vedigere, hemû kovarên ku derdihatin, Zanîn, Gülistan, Stêr, Aso, Gelawêj, Bihar rawestiyan ji kokê de. Rojnameyan jî mîna Delav, Hêvî, belê ev bi xwe davekî di dema ku em cardî vejerin zimanê erebî û pê binivîsin, dîsa vejerin ku xêzên sor li rû-pelê me bikevin. Ev gotin ne girîng e û ev hevok xweziya tune be û ev navnîşan divê hilê û nemîne û wisa jî bobelatên din jî ya herî xuya ku em dîsa bêne avêtin qonaxa tîrsê, ev bi xwe şikestinek e li gorî ku li hawîrdora me bi dehan kovar û rojnameyên wane dertê û bejnîne me hembêz dikan.

Teskereya Helbestvan:

■ Fethulla Huseynî, di sala 1970'yî de li bajarê Dirbêsiyê li Başûrê Biçûk ronî dîtiye. Xwendina xwe ya bilind li Zanistana Helebê li Zanîngeha Mafan berhemên xwe bi kurdî û erebî dinivîsine. Berhemên wî yên ku hatine weşandin: Kişwera Şehîdan, helbest, 1992; Firyada li Hevdayî bi Mizginya Reş, helbest, 1994; Ne Wisa Aye-tên Dojehê têne xwendin, helbest, wê bê weşandin.

Kitin hilbijartî ji helbestêن Fetullah Huseynî

1.

Durvê min i li hevdayî bi keldûmana wêraniyê
Li banê bîrê çêke, mîna ew bi xwe be
bela here û here
heta nemîne temen
bi ber wêraniyê de here
mîna tu berê xwe bidî bakureki
-bê pirs-
ey rahêjvanê kefen
tu jî zû bar ke bê misteke ax...!

2.

Kavîlê mayî ji rastiyê
baxekî şikestî ye di nav pêlén payîza bê de,
rastiya tu li ser digirî, li hevye ye.
rastiya rondikên te dikşîne
tevnek ji peyvî ye
rastiya te li gorê dinalîne
dilê wê li revê ye
herdu zarokên ji kerwanê mirinê mabûn
dipirsin:
Welatê em jê hez dikan yê kî ye?

3.

Bi wê ziraqê re bêriya dîtina xaça bedewîtiyê bike,
min jî bêriya te kiriye
weki tu, hilata welêt bi
bi zorê jê dûr ketime
ev lekeya kor li ser eniya kerwan
tu kes hil nake,
ji bilî gemiya hatina nûrojê
li ser ruwê ava jiyanê

4.


Wekû nîsaloxeke derewîn, belav dibim ez,
li nav mîja nîgaşê çend xwedî tamayên şikestî
û xewnîn çend kesen ji min hez dikan,
her ji hev dadiwerivim
û çend hevalên bêkér
maseya mirina min xweşik dikan

5.

Eger min,
sazek sermedî da xweşiya welatê xwe
û stranek şewîfî wek rewşa Helebça
diyari zengeloka hejaran kir
û ramûsanek di xewnî de da te
ez ê bême darvekirin..
Ji ber ji mîj ve van qedexeyan
vedişêrim!

6.

her weki, te Feqê Teyran din kir
wisa çarenûsê xwe nas dikim
Ev ode û text û kefen



"Xwezî bi kurdî şor bikira"

Ez li gara otobûsan, ji bo çûyina Welêt, li otobûse siwar bûm. Li koltuxa rex a min, ciwanekî bîst û du-sê salî rûniştibû. Ji porê wî, yê bi makîneyê hatibû kurkîn xuya bû ku leşker e. Min silav lê kir û ez li cihê xwe rûniştim. Wî ciwanî jî bi ser hejandinê, silava min wergirt.

Ajotkarê otobûsê, otobûs bi ger xist û hêdi hêdi da ser riya ku em ê pê de henin. Bi desthejandinê, careke din min ji hevalan xatir xwest. Otobûsa me, mîna ku xwe berde nav behreke pel-pelinî, wîlo ket nav traftîka Stenbolê ya ku wekkî moristanan dimesiya.

Va despeka rîwitiyeke dirêj, ku heşdehî-bîst seatan dikesabû. Hîn di wê sefatî de, xengimîyeke dilê min ragirtibû. Ew xeyalîn ku çuyîma Welêt, dijî min har dîkirin û mîna çükén seri ji wan dikin, dilê min wisa wedipirtikî. lê belê, vîga ji bo çi xemgîni? Vê hewa gebsoyi, ji bo çi ragirtibû dînya min? Min da vejetîna zar û zêcan? Min da vejetîna heval û dostên nû? Na. Divê ez dilşa bibûma, çunkî di dawîya vê rîwitiya bi zehmet û dirêj de, dê û bayê min û giheştina heval, hogir û yarên kevn hebû. Di serî de jî giheştina welat hebû!

Axx.... Welat. Ew welat nîn e ku, sedema helbestvaniya min û her tim mijara helbestênen min e. Ew welat nîn e ku, her di dilê min de ye, geh dibe qérîn, geh dibe lorîn, geh dibe kilam û geh dibe helbest. Ez bi welêt ve dikevin xewê, welat di xewê de xewn û pê ve hişyar dibim.

Welat, xurînî, taştê, firavîn û şîva min e. Welat; tav e, hewa ye û sedem û wateya jîna min e. Ma gelo ev hewaya gebsoyi ji bo çi? Tu dibê ka bêhna bîso, bîhna barûtê, bîhna xwînê ragirtibû pozê min. Dilê min li hev diket, çavên min li şevrê dicûn. Dînya li serê min teng dibû. Ez ketibûm nav behra xof û tîrsê, lêbelê ez ê çawa derketama, min nezanîbû. Ku tu li zeviyeke xwe, gérîs diçinî, hîrc û beraz dikevin navê û garisê te talan dikin! Wê çaxê tu hêrs dibî, lêbelê tu tişt jî ji destê te nayê, keda te, zar û zêçen te, di bin lingên hîrc, beraz û hovan de diherimin. An jî deriyê hewşa mala te vekirî dimîne, bi şey rovî dikevî û mirîşk û ordekîn te giştan qîr dîkin. Aha welat, aha zevî û hewşa derî vekirî maye.

Ev çi rewsek kambax e Xwedêyo! Ev, çawa kar e ku iro kuçikîn me jî, bi hîrc, beraz û roviyan ve bûne hevpar.

Iroj welat wêran e.


Iroj welat talan bûye.

Iroj welat dişewite.

Iroj insanê min tê şkestin.

Tenê yên ku nikarîbûne bişkînin, hêviyîn min ên li ser ayende ne. Ez bi denge hevalê rex xwe, di nav wan xof û xeyalîn kûr û dilxwar de, hişyar bûm.

Heval pîrsî, ka ez jî ku derê me û rîwitiya min ber bi ku derê ve ye. Lêbelê



ez wekî ku di xewek giran de û her, bi termê şevê re têkoşîneke dijwar bidim, wisa xwîdanek res, ragirtibû bedena min. Bi rastî jî, ez hîn nehatibûm ser hemdê xwe. Girêkek ketibû gewriya min. Bi kuxikê, min gewriya xwe paqîj kir û min gotiyê: "Ez jî Gextî me û diçim Gextê." Heval, dilgesiya xwe nîşan da û got. "Ez jî Gextî me. Min leşkeriya xwe nû qedand. Ji ber ku min, destûra salane bi kar neanîbû, min geleki bêriya welêt kiriye, hele dê û bayen min, ji pêş çavên min difûrin. Hejde meh çawa borîn, min fam nekir, lêbelê ev hejde seat naqedin." Gotinê wî wekî têkevin guhekî min û di yê din re derkevin, xema min nîn bû. Lêbelê ya ku bala min dikişand, min her çiqas bersiv bi kurdî didanê jî, ew bi inat bi tirkî diaxivî. Min yek tan jî lê didan lê zilam aciz nedîbû. Wekî tiştekî gelekî normal.

Kurmanciya herêma me jî baş fam dikir. Lêbelê bi kurdî nediaxivî. Min da hewa leşkeriyê. Çunkî min dîtbû û gelek jî bihîstibû, gelek însanîn me, ew ên bêfam, pişî leşkeriyê, li eslê xwe û li kurdiyê xwedî dernakevin. Rewşa wan bêxîretan wekî pêkenokan li ser zimanê gel bû.

Mînak; Ciwanekî nû leşkerî qedandîye vedigere mala xwe. Dê û bayê gundiyên wî dîkin nakin, ew xwe jî kurdî re laj dike. Lêbelê bi tirkî baş nizane. Pêzanîn li aliye, bes du-sê bêjeyen tirkî ji ber kirine. Rojekê diya wî jî bo çêre

sêxîl berdide. Wî ciwanî jî xwe daye be-roj û wisa dibêje: "Kidê gel". Pişte karîkekê hembêz dike, destê xwe dide qoliç karikê, ku hîn nû dane der, wiha dibêje: "Ana bu singleri kim seri bu da çaxmêş yapmêş? (Daye kê di serê vê karîkê de ev singana kutane?)"

Ev mînakana gelek in lêbelê ne mijara me ye. Min got dibe ku ew zilam jî wilô be. Ji ber vê yekê ez li ser nesekînim. Ci çare lê ciwê dev jî min bermedida. Acîzbûna min fam nedikir û bi kîfxweşîya dilê xwe pîrs li min dikirin û diaxivî. Diaxivî lêbelê her bi tirkî. Min jî inat kiribû, ez qet bi tirkî neaxivîm. Bi xêra Xwedê re, ciwan bi xew ve çû û min jî firseta pirtûk xwendinê bi dest xist.

Ajotkarê me vêsanekî (mola) din dabû. Ev vêsanâ çendan bû, nizanîm lê min hevalê xwe hişyar kir û em ji otobosê dagêşîyan. Dînya sar bû. Baran hûrik hûrik dîbarî. Zûtirkê min dest û rûyê xwe şûştin û li aşxaneyê min bi hevalê xwe yê rîwitiyê re xurîniya xwe kir. Peyre jî me cixarek kişand. Em dîsa li otobosê siwar bûn. Edî riya me hindik mabû. Bi qasî du-sê seaten din em ê bigihiştana cihê xwe. Heval bi israr, ez dawetî mala xwe dikirim. Min dikir nekir çare nedidîdit. Digot: "Keko, gundê we li ser riya gundê me ye. Kerem bike, işev bibe mîvanê min. Hem tu yê vehêsi û bi serikî zindî biçi gundê xwe û hem jî dê û bayê min dê bi hatîna te gelekî

dilges bin. Haya dê û bayê min heye ki ez ê iro bêm. A niha birayê min li Gextê li hêviya min sekiniye." Bêçare mir got, baş e. Heval dilges bû, spasiyê xwe pêşkêş kirin.

Pişî nîvro em gîhestin Gextê. Em li garê ji otobosê peya bûn. Bi rastî birayê hevalê min li benda wî sekiniybû. Min carekê din hebekî xwe giran kir lê belê tu fêde nîn bû. Birayê hevalê min israr, kir hem jî bi kurdîyeke gefîri. Ez ecêbmayî mam. Ez zêde dirêj nekim. Em li taksiyê siwar bûn û me da ser riya gund. Bi qasî deh-pazdeh deqîqeyan em gîhisim gund.

Dê û bayê hevalê min li ser re kom labûn. Em çaxa ji taksiyê peya bûn, li bîr lingîn hevalê min beranek ser jê kişîn. Dî nav wê koime jînepirekê her du destê xwe ber bi jor ve kirin û wiha dua kir: "Ya Reb! Min hatîna torînê xwe ji eskeriyê dît, carekê jî min bidita ku torînê min, bi kurdî şor bikira, min ê qurbanek din jî ser jê bikira û li feqîr-fuqaran belav bikira."

Ez bi duayê jînepîre carekê din ecêbmayî mam. Tiştê ku ez li ser sekînbûm, vê carê ji min re bû meraqke giran. Em gişt bi hev re hilkişyan mala wan.

Pişî nimêja işayê civata gundî belav bûn. Ez û kesen malê tenê man. Firseta ku ez meraqa xwe jî berim, min bi dest xist. Min li firsetekê anî û gotê, "Xaltîyê! Min tu tişt jî wê dua te fam nekir, tu ji kerema xwe re dikarî ji min re bêjî? Xaltî fetîli ser min û got: "Xaltî bi qurban!" û keserek kûr kişand. "Torînê min hîn nû dest bi mektebê kiribû. Mualîm wî yê bavkafir, ji talebeyan re şorkirina bi kurdi yasax kiribû. Hînek talebeyen xwe jî wekî xefîyan kiribûn. Torînê min jî û talebeyen wekî wî jî, bi tirkî nizanîbûn. Rojekê li mal, torînê min çaxa ku şor dike, tu nabê ku xefîkî bihîstiye û giçîyê wî li bal mamoste dike. Mamosteyê bavkafir û bavzalim, gelekî li torînê min dixe. Torînê min hat malê, ku ji girî zi-wabûye. Me kir nekir şor nekir, tu dibê qey lal bûbû. Heta ku çend kelimeyên tirkî, ezber nekirin, me dengê wî seh nekir. Heyran! Vê car ez bi tirkî qet fam nakim. Ev e pazde sal in kurê min şor dike, ez tu tişt jî fam nakim. Ez jî xwe re li devê wî dînihîrim. Ger, ku bi kurdi şoran bike, min gotiye, ez ê qurbanek ser jê bikim û li feqîr fuqaran belav bikim. Xwedê şahidê min e"

Wê şevê, ez li mala hevalê xwe yê rîwitiyê razam. Sibehê pişî taştê, min bi spasdarî xatir ji wan xwest û min da ser riya gundê xwe.

Vîga haya min jê nîn e, ka ew ciwan bi kurdî diaxife an na?

Ger biaxiviya baş dibû. Qet nebe belengaz û rebenê wî gundî wê zikek goşt bixwarana.

BERHÎM PAŞA

*Gextê (Kolik, Kahta) navçeya Semsûrê ye.

Li Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê

● 25 tîrmeh 1998 şemî:

Konsera Koma Agirê Zerdeş (ji NÇM' ya ïzmîr), saet:15:00

● 26 tîrmeh 1998 yekşem: Konsera Koma Agirê Zerdeş, saet:15:00

Yekîtiya Malbatên Mezopotamyayê "Ji Xwarinên Kurdf Çend Mînak"

saet:17:00

● 31 tîrmeh 1998 ûn: Film:Ağit (Zêmar) Derhêner: Yılmaz Güney

saet:18:00

ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



Li NÇM ya ïzmîrê

● 25 tîrmeh 98 şemî: Roja Xwarinên Kurd ya Kevneşopiya 24'an, saet:18:00

● 26 tîrmeh 98 yekşem: Konsera Sûra Welati Koma Tofan, saet:17:00

● 31 tîrmeh 98 ûn: Gotûbêj: "Helbest û Ristawê", saet:19:00

Li Navenda Çanda Alternatifê

25 tîrmeh 98 yekşem: Li Tirkiyeyê çîna karkeran û bizavê sendikayî Sîri Öztürk (Lêkolînvan-Nivîskar), saet:14:00

TÎSK



Yewbiyene ser ro

LERZAN JANDÎL

Tawo ke ez newe amêy bî Almanya û yew komela almanan de xebetiye, zaf çiyê hevalanê mi nê xebetkaranê almanan ere mi xêlê bêmane, ecyâp amêne. Ciyo ke nînan ra balê mi zaf ant bî û ez nêşîkiyêne fam bikerê, o bî ke tawê tîmî de (karê grupe) mi vatêne nê nika danê pêro, nika yew bînan ra xebêr danê yan jî çiyêde bîno xirabin kenê. Çimke gegane hêni qêrêne re yewbînan, ke mordem mecbûrê niya fikriyene biyêne. La belê tîm ke qediya, her kesî dest kerdene ci, karo ke gureto xo ser, kerdene. To vatêne qey qe çiyê nêbiyo. Guma dem ke derbaz bî, mi rojê pers kerd, Mi vat: "Şima tîm de hundê gêrenê yewbînan ra, yewbînan ra hêrs benê, la belê tîmî ra dime, her kes karê xo keno. Ti vana qey qe çiyê nêbiyo. No se beno, izahê naye cîko?"

Hevalê mi nê karî vat ke: "Mesela mesela maya şexsi niya. Ma wazenîme ke wa karê ma bê qusur, bê këmasiye bero kerdene. Çimke ma pêro naye wazenîme. Sebeta ke karê ma rind bêro kerdene, ganî ma ji fikiye xo zaf eşkera bivacîme û yê bînan ere raşîya fîkrî xo hidime bavîarkerdene. Seba naye ji tim ra dime her kes karê xo keno."

Ma şarê ma miyan de piya kerdene û badî jî yewbînene se êna famkerdene? Ma pêro rindek zanîme, ke şarê ma va fiê prensîban, metodan seba piya karkerdene yan jî yewbiyene wo, yan jî bê sebçebanê maqulan düştê piya karkerdene yan jî yewbiyene wo.

Yan jî eke ewro piya kar kerd yan jî yewtiya viraşte, meşte seba çiyêde bêqedî, çiyêde zaf qîjî yewtiya xo xerepnene, benê dişmenê yewbînan. Ma naye dewîjanê xo miyan de, eşîranê xo miyan de, kesanê xo inîyan de zaf rakerde vînenîme.

Ê ma vacîme mevacîme nê edet û karekter ebi perwerdekerdene derbazê domanar beno. Doman jî bado zê pîlanê xo kenê. Ez bawar kena, ke ma de bingeyê yewnêbiyene de na xuye esta.

Yê didîne, sebeta ke kar mero doşanê ma ser, ma karî ra biremîme, ma seba yewtiye zêde cat nêkeme. Çimke yewtiye de her kes qasê qiweta xo, bawariya xo ganî kar bikero. Na zî nêna re ma.

Yê hîrêyîne, ma de tahamûlê yewbînan nêkerdene esta. Tahamûlê fikranê û bawariyanê bînan çîna. Eke ma ra ciya bifikiriyo, zê ma romenişo ra mewurzo, ma tahamûlê domanê xo nêkenîme. Keso ke tahamûlê ewladê xo nêkeno se tahamûlê yê bînan keno.

Ya çarîne, ma tayê bereda amêyê pîlkerdene. Her kes xo zê miyanê dinya vîneno. Xo her çî, yê bînan qe çiyê vîneno.

Ya pancîne, ma politika, îlmî politika sloganan ser ro musayme. Raşîya ma, raşîya şarê ma û politika nêyame tîlewe. Raşîya şarê xo ebi zor bestenîme politika ra. Na jî realîte de nêna ca.

Ya şeşîne, ma ke dîroke de niyadîme, areste vînenîme, ke şarê ma ebi mudahaleya teberî-nê kesî, parfî, yan jî dewlefî benê-xo miyan de yewtiye viraşta.

Eke armancî ma yew o, eke ma wazenîme biresîme nê armancî, eke ma girêdayiyê menfatê şarê xo yîme, eke eleqeya ma û dişmenî çîna, ciyo ke beno astengê yewbiyene cîko? Ma şaranê bînan de, organîzasyonan şaranê bînan de yewtiye virazenîme, la belê xo bi xo nêşîkinîme bîvîrazîme. Naca deyew çewtiye, şaşîye çîna? Qe quisîre ma jî, xusîre dinan teynâ nê, ê ma jî çîno?

Ebi kîlmiye, kesê ke wayîrê eynî armanciye û wazenî biresî nê armancî, girêdayiyê menfatê şarê xo yê, tahamûlê yê bînan kenê û ere xo bawarê, şîkînê yewbiyene xo bîviraze. Sebeta ke yewtiya xo mevîrâzê, çiyê ke ênê vatene, zaf ebi qedrî niyê, zaf jî rasi niyê.

C. ANDOK/ STENBO

Seroka Komeleya Jinên Azad Mûrvet Yilmaz:

Zarokêñ xwe raman-azad mezin bikin



Di panela li ser perwerdehiya zarokan û rola dayikan de, nêzî 70 dayikî amade bûn.

Roya 18'ê tîrmeha 1998'an li avahiya HADEP'a Beyoğlu ji hêla Komeleya Jinên Azad ve panelek bi sernavê "Perwerdehiya zarokan û rola dayikan" hate lidarxistin.

Seroka Komeleya Jinên Azad Mûrvet Yilmaz û Rêvebera heman komeleyê Zübeyde Oğurlu beşdarî panelê bûn. Mûrvet Yilmaz li ser "Perwerdehiya zarokan û Rola dayikan" bi tirkî axivî û Zübeyde Oğurlu jî axaftina Mûrvet Yilmaz ji beşdaran re wergerande zimanê kurdî.

Mûrvet Yilmaz pêşî li ser rewşa zarok di wexta ducanîbûna dayikê de sekînî û got: "Bî ducanîbûna dayikê re perisina (kemîlîn) psîkolojiya zarok dest pê dike. Dayik gava ducanî dibe psîkolojiya dayikê çawa be, bandorê li zarok jî dike." Yilmaz bi dûv re li ser rewşa gelê kurd sekînî û ev got: "Zarokêñ keç di nav şîniya malbatê de nayêñ hejmarin. Em her gav keçikan di rêza duyemîn de û lawikan jî di rêza yekemîn de dibinin."

Emê zarokêñ xwe çawa xwedî bikin?

Mûrvet Yilmaz li ser pirsa "Emê çawa zarokêñ xwe xwedî bikin?" sekînî û got: "Dewlet zarokêñ me di dibistanêñ mecanî (yatili okul) de wekî şexsiyeteke/î ji xwe dûr, ji çand, ziman, malbat û welatê xwe dûr û zarokeke/î stûxwar û reben têne hêvatin. Ew êdi zaroke-

ke/î wisan e ku serî hilnade, stûxwar e û tirsonêk e. Niha dibistanêñ me tunene. Divê dayik ji zarokêñ xwe re bibêje çîma diçe wan dibistanan, li wir wê çi hîn bibe, çi hîn nebe û divê mirov wê/wî bi şexsiyet, ne tirsek lê wekî şexsiyeteke/î kurd mezîn bike. Divê nebêje tu keç i, tu tiştekî nizanî, tu law i, tu her tişti dizanî û tu dikarî herî her cihî. Ev şexsiyeta kurdên berê ye."

Seroka Komeleya Jinên Azad Mûrvet Yilmaz da zanîn ku dewlet dixwaze bi televîzyon, futbolê û di kafeyan de zarokêñ me wekî şexsiyeteke/î pey berjewendiyê sîstemê perwerde bike û wiha got: "Pêwîst e ku em li zarokêñ xwe xwedî derkevin û nehêlin ku ew biçin van cihan û em xweşîkbûna welatê xwe, rojname, televîzyon û sazgehêن xwe nîşanî wan bidin û wan bikin xwedîyê şexsiyeteke/î azad." Her wiha Yilmaz, koçberbûna kurdan bi bîr xist û xwest ku jînên kurd sedema koçberbûn û rewşa ku kurd di nav de dijîn ji zarokêñ xwe re bibêjin.

Seroka Komeleya Jinên Azad Mûrvet Yilmaz, axaftina xwe bi van gotinan bi dawî anî: "Pêdivîyê zarok ên xwezayî hene, divê em wan jî bînin cil. Em wan bîbin parkan bigerînin, ji wan re kilaman bibêjin, hestêñ xwe bi wan re parve bikin, hêjahiyê bidin wan û ji wan hez bikin. Gava tu ji zarok hez bikî, zarok jî dibîne ku yek hêjahiyê dide wê/i, ew jî bi xwe bawer û bi tendûrisî mezîn dibe."

C. ANDOK/ STENBO


Lor Lor

Lor lor lor dayê lor neke
 Deşta Amedê germiyani germ e
 Wêrana Amedê germiyani germ e
 Hespa Şik axa kihêlî nerm e
 Şik axa kuştine malê me birine
 Lor lor lor dayê lor neke

Lor lor lor dayê lor neke
 Deşta Heranê germiyani germ e
 Wêrana Heranê germiyani germ e
 Hespa Şik axa kihêlî reng e
 Şik axa kuştine bi nav û deng e
 Lor lor lor dayê lor lor neke

Lor lor lor dayê lor neke
 Deşta beriyê germiyani germe e
 Wêrana beriyê germiyani germ e
 Hespa Şik axa gelekî gewr e
 Şik axa kuştine nav gola xwînê
 Lor lor lor dayê lor neke

Berhevkar: Roşan Lezgîn

**Delal**

Delal heyra qurba bang te dikim deng ji
 te nayê
 Ez dibêjim delal were delal nayê
 Ji êvara Xwedê de ranezame dikim nakim
 sebram nayê
 Delal heyra derdê dila pir dijwar e ray le
 nayê

Delalê dilêm bengî bûye karkî nake
 Ji sibê heta êvarî li nava gund digere milê
 xwe li ba ke
 Lo lo rebeno te hay tune wê bavê min min
 ji xelkê re siwar ke
 De were bi çepê min bigire bibe ji xwe rei
 kevaniya mala ke

Delal heyar qurba eba soro lo eba çefi
 Ne ner li vî aliyî lo li vî terefî
 Ez dizanim wê li texin lo derba xefi
 Heyfû mixabina wan diranê tey sedeffi

Adar Jîyan

Destegulek

ji çanda kurdan a devkî

Stranê li ser govendê

Li min û diyarê Entaxê loy loy
 Li te û diyarê Entaxê way way
 Pez berdane palaxê loy loy
 Pez berdane palaxê way way

Li min û diyarê Qurmikê loy loy
 Li te û diyarê Qurmikê way way
 Mîna mastê xilikê loy loy
 Minâ mastê xilikê way way


Li min û diyarê Hendîvê loy loy
 Li te û diyarê Hendîvê way way
 Kevoka li ser bihîvê loy loy
 Kevoka li ser bihîvê way way

Erdo pîlo filhano
 Bay keynan haw awdano
 Keyna qic min nedan
 Înselleh kiyede bimano

Min serê banî rito
 To binê banî rito
 Min çim to ra şikito
 To xo min ra nimito

Serê leme honik o
 Binê leme honik o
 Çicê keynan qopik o
 Nefsê xortan tenik o

Serê yenî mizac o
 Binê yenî mizac o
 Xortan giroto desmac o
 Namê lacî Sirac o



Arekerdox: ROŞAN LEZGİN
Strana dilan

Karwanê mala bavê min bar kirin ji
 karwanê reş komirê
 Bila dananyana li rasta kaniyê lo li
 rasta pirê
 Bila bihatana cewaba ap û xalên bav
 û birê
 Belê bila nehatana cewaba lawê
 xelkê lo sebrê dilêm

Lawiko dîno şeva dinê min di xewna
 xwe de dît ku ez dimirim

Herêm: Licê

Delalên gundê me derketin serê
 bana ez bang kirin
 Qız û bükên gundê me rabûn zend û
 bendê xwe hilkirin
 Dest û kewdêne malik xirab tijî ava
 sar dikirin
 Bi nav hev û din girtin li agir kirin
 Çend heb jinê navsale hatin ez
 şûştim lo kefen kirin
 Yadê rebenê ez li ser darbesta
 miriyan kirin
 Dû re ez hildam li ser milên xortan
 kirin
 Di ber derikê delalê dilê min rebenê
 derbas kirin
 Sebrê dila li ser banê qesrê sekînî bû
 ez pirs kirin
 Got: "Lê lê dînê ma tu çawa yî? Tu
 dibînî va li vir im"

Pirs û sewala delalê dilê xwe dibirim
 Dibêm: "Lo lo dîno bi sond û qesem
 roj ji roja din xerabtir im
 Min nêrî ku hêstirêن çawan her du
 rûkêñ wî sil kirin
 Ez zû bi zû ji ber çavêñ sebrê dila
 winda kirin
 Di kuçe û kolanêñ gundê mala bavê
 min rebenê berjêr kirin
 Gundî û cîran tevr û bêrêñ xwe kar
 kirin
 Ji mi evdala Xwedê re tîrbek heft gaz
 hazir kirin
 Bi şirît û bi kindira ez daxili qebra
 reş û tarî kirin
 Lo lo lawiko dîno tuyê werî lingê
 xwe li kîlikâ min xe bêje: Lê lê sebrê
 lê lê dînê gelo te kul û kederêñ mala
 dijmin û mère xirab ji bîra kirin?

ADAR JIYAN

Vate bî yewserî

Kovara Vate, bi hejmara xwe ya dawî ango çaremîn salek li pey hişt. Wekî nas e, Vate xwerû bi dimilkî (zazakî) ye û bi şeweyekî demsalî té weşandin. Di vê hejmara Vateyê de sebaret bi ziman, zargotin, dîrok û wêjeyê nivîsên cur bi cur hene.

Di vê hejmara Vateyê de nivîsa Cemil Gündoğan a bi sernavê "Kovara Vateyî û Têkiliya Lehçeyanê Kurdkî Ser o" hêjayî nirxandinê ye. Babeta vê nivîsê, bêhtir li ser têkiliya zaravayê kurdî, rewşa dimilkî û nêzîktedayina kurdên din a ji bo dimilkî germ bûye.

Gündoğan, helwesta li beramberi Vateyê wekî sê koman diyar kiriye. Koma yekemîn, kovareke bi vî rengî pêwîst nabîne û vê xebatê ji bo yekîtiya kurdan wekî talûke dibîne. Ji ber ku di kovarê kurdî yên din de nivîsên dimilkî derdikevin. Lé bi dîtina Gündoğan, ev kes her diçe kêm dibin. Koma duyemîn jî berevajî koma jorîn difikire û Vate wekî xebateke pêwîst û bikêr dibîne. Nivîskar, ji bo koma duyemîn, wekî mînak nivîsa Gerînendeyê Giştî yê Azadiya Welat Sami Tan jî daye û wekî helwesteke erêni bi nav kiriye.

Cemil Gündoğan, bi taybetî li ser sedemîn helwesta koma yekemîn rawestiyaye. Gündoğan, her çiqas behsa şovînîzma kurdên kurmancîaxêv kiriye ji her wiha gotiye, ji ber ku pêgeha (kapsam) kurmancî ya cografik, bazarî û e-debî firehtir e, kurmancî serdest xuya dike lê di bingeha xwe de tiştekî bi vî ren-

gî ne li dar e. Di heman demê de nivîskar, helwesta MED-TV'ye ya li ser zaravayê kurdî wekî helwesteke pozitif bi nav kiriye.


Ji bo ku mirov di vî warî de nirxanîn têr bike, pêwîst e li serpêhatiya milleten din bikole. Ji ber ku kurd piranî li ser vê yekê ne xwedî zanîn in, dil dikin yekser hevdu fêm bikin. Lé ev pêvajojoa bingehin e. Lé di ber re divê xwe nêzîki zaravayê din jî bikin. Wekî mînak "bilind" di soranî û dimilkî de "berz" e. Divê di kurmancî de jî peyva "berz" derkeve pêş. Dîsa di kurmancî û soranî de "heyat" "jiyan" divê di dimilkî de jî jiyan bê bikaranîn. Yek jî divê kurd berê xwe nedîn peyvîn nû, bidin zaravayê din. Di heman demê de peyvî divê li mantiqê zaravayê jî bê anîn. Bo nimûne, peyva "serhildan" di dimilkî de wekî "serhewadayin" tê bikaranîn. Di vî warî de Vate, li pey zimanekî yekgirtî ye.

Li aliyê din wekî Gündoğan gotiye, rewşa dimilkî ya edebî jî dibe sedema nirxandinê şas. Wekî mînak, iro wekî helbest li ber destê me bi sedan helbesten kurmancî hene. Lé yê dimilkî ji çar-penc helbestan naborin. Li hetê din ji ber ku bêhtir pêwîstiya dimilkî bi pêşketinê heye, xwerû dimilkibûna Vate di vê demê de pêwîst e. Lé pişti demeke dirêj, ji ber ku zarava ji hev dûr nekevin, divê cih bide nivîsên bi zaravayê din jî.

Di vê hejmarê de Haydar Diljen jî, di bernameya partiyen li bakurê Kurdistanê de li benden der barê zimên de kolay. Memed Drewş jî pêwîstiya yekgirtina alfâbe û rastnivîsa kurdî anîye ser zimên. Di nivîsa Memed Drewş de be-

pêvajoja bingehin e. Lé di ber re divê xwe nêzîki zaravayê din jî bikin. Wekî mînak "bilind" di soranî û dimilkî de "berz" e. Divê di kurmancî de jî peyva "berz" derkeve pêş. Dîsa di kurmancî û soranî de "heyat" "jiyan" divê di dimilkî de jî jiyan bê bikaranîn. Yek jî divê kurd berê xwe nedîn peyvîn nû, bidin zaravayê din. Di heman demê de peyvî divê li mantiqê zaravayê jî bê anîn. Bo nimûne, peyva "serhildan" di dimilkî de wekî "serhewadayin" tê bikaranîn. Di vî warî de Vate, li pey zimanekî yekgirtî ye.

Li aliyê din wekî Gündoğan gotiye, rewşa dimilkî ya edebî jî dibe sedema nirxandinê şas. Wekî mînak,



r a m - berî "lirekor-raverîn(rekor kirmak)" "rekor şikitin" hatiye bikaranîn. Ev mantiqê tirkî ye.

Wekî din ev nivîs di vê hejmarê de hatine belavkirin: "Derheqê Kirmancî de Kombiyatî Çarîne", "Hepveyîn ligel Dengbêj Serdar", Lerzan Jandil "Sedsera 19ine de Halê împaratoriya Osmaniyan û Vuriyenê nê Demê", Münzûr Çem "Vilikê Verê Vare" û "Çend rojnamayanê Fransî û İngilizî de Xoverdayîş Dêrsimî".

MAZLÜM EŞREF

meymûnekî ye. Li ser vê planê, hevala wî dizivire bal dostê xwe yê Meymûn û halê wî dipirse. Meymûn dibê gelo çima tu ewqas dereng hatî? Kûsî dibêje: "Min pir fedî kir ku carekî din destvala bizivirime çem te. Lewre te bi min re pir îkram kiriye û her tim hêjîr daye min". Meymûn dibêje: "Tu xeman nexwî, tenê ev e mebesta te ya qenc, bes ì min e." Lé kûsî razî nabe û dibêje: "Ez dixwazim, te li mala xwe biezimînim û ji binê qencyen te derkevîm." Meymûn dibê: "Rind e, lê ez nikarim di deryayê re derbas bim û bêm mala te." Kûsî dibê: "Ez ê te bidime ser pişta xwe û derbas bikim." Bi vî awayî meymûn li kûsî siwar dibe û diçe. Qasekê di avê de dimeşin. Kûsî serê xwe dikişine qalik. Meymûn dibêje: "Hevalê kûsî tu çima wisa dikî?" Kûsî dibêje: "Welahî ez li hemberî qencya te nikarim tiştekî hêja bikim, lewma ez ji ber xemgîniyê serê xwe dikîşim qalikê xwe." Demek dibore, dîsa kûsî niyeta xwe xirab dike û dixwaze xwe di avê de noq bike û meymûn bixiniqne. Meymûn dikeve nav gumanan û dibêje: "Heval tu çima wisa dikî?" Kûsî dibê: "Ez pir ji bona hevalê xwe yê nexwes xemgîn im, loma ez wisa dikim."


Kûsî meseleyê bo meymûn vedibêje û meymûn mebesta wî ya xirab fêm dike û dibêje: "Heval, te çima ji min re negot! Minê dilê xwe bixwe re bianiya." Kûsî dibê: "Heval çima dilê te li ser te ye? Meymûn: "Adetê me ye. Dema ku em diçin rîwîtyê, em dilê xwe li mala xwe dihelin. Ji bo ku dilê min dermanê hevalê te ye, min bizivirîne mal, ez wî bi xwe re bînin". Kûsî dema wî dizvirîne, meymûn dikiş serê darê û dibêjê kûsî: "Hevalê kûsî! Em Meymûn wekî kerê

bêdel û bêguh nîn in." Kûsî dibê çawa ? Meymûn lê vedigerîne: "Li daristanekî şer û wewîkeb bi hev re dibin heval û dijîn, lê şer pir pîr û gûrî dibe. Ji wawikê re dibêje, heval dermanê gûrê min dil û guhê kerê ye. Wawîk dibêje: "Padışahê min ji wî hêşantir ci ye! Ezê herim ji bona te kerekî bînim." Wawîk digere û kerekî jar û hejar dibîne û jê re dibêje: "Kerê hejar! Tu çima nayê ez te biherim cihêkî pir çêre û pir av." Ker dide pey wawikê û diçe nêzîkê warê şer. Wawîk diçe cem şer û jê re dibêje: "Padışahê min, min ker anî. De here guh û dilê wî bixwe. Şer dema diçe hinda kerê û êrişê dibe ser. Ji lew re ker direve û diçe cihê xwe yê berê. Careke dinê wawîk diçe çem kerê: "Kero! Tu çima hatî vir ? Şer xwestiye bi te şa be. Ez hatim ku dîsa te bibim." Lé şer vê carê ji êrişê dibe ser kerê û wî dikuje. Peyre dibêje: "Divê ez herim ser avê û xwe bisom, pasê werim kerê bixwim." Lé wawîk keysa xwe lê tîne û dikeve ser dil û guhê ker. Şer dema tê, dibîne ku ne guh ne jî dilê kerê maye. Dibêje: "Kanê guh û dilê kerê!" Wawîk dibêje: Padışahê min! Dema ku guh û dilê wî hebûya, gava ku ji destê te filiti, êdi carekî din dihat bal te?"

Belê bi rasîf ku dil û guhê xwefiroş û çahsan hebûya, wekî kerê nedizivirîn bal dijminê gelê xwe. Wê bigotina: "Hey dijminê bêwicdan! Te hetanî iro te xwîna me rijandîye, em te baş dinasîn û bi te re nayen dor maseyan û tu me dixapînî." Dîsa wê bigotana: "Em êdi wekî meymûn hişyar in, xwe nedîn destê dijminê xwe." Wekî çawa ku di hedîsa Pêximber de hatiye gotin: "Kesên bawermend di qullekî de, du duran pêvedana wan çenabe."

Kûsî û meymûn, wawîk û şer

CELALETTİN YÖYLER



Jî pirtûk a bi navê "Kefîlet û Dimnet" çend hîkayetên manîdar.

Dibê di daristanekê de, padışaheyerî meymûnan, bi navê Mahir hebûye. Ev meymûn, di nav salan re deûbas dike û pîr dike. Meymûnekî ciwan zordariyê lê dike û dike padışahê meymûnan. Dema ku padışahiyâ Mahir jê tê standin, direve û dike qeraxê deryayê û li ser dareke hêjîrê ji xwe re warekî ava dike. Meymûn ji hêjîrên darê, hem dixwe hem jî yek heban davêye nava ava deryayê. Dema ku davêye, kûsî ji xwe re berhev dike û dixwe. Bi vî awayî kûsî dike û meymûn. Dem û zeman dibore, hevalê kûsî ji bona nehatina hevala xwe xemgîn dike û ji hevalen xwe yên din re, xemgîniyâ xwe diyar dike. Hevalen wî jê re dibêjin: "Hevala te bûye dostê meymûnê, loma pirsa te nake." Li ser vê yekî kusiyê nêr û hevalen wî planekî digerînin û dibêjin; dema ku hevala te hat, tu bêje ez nexwes mirinê me. Lé dermanê min, xwarina dilê meymûnekî ye. Dema ku kusiyâ mê dizivire cem hevalê xwe, hevalê wî jê re dibêje, ez nexwes mirinê me, lê dermanê min dilê

Nifirêن post-modern

Gelê kurd ji zû de ye ku ber bi xér û xweşiyê ve gavan diavêje. Êdî nifirêن gelê kurd ji diguherin. Ev nifirêن jérin niha li dilê gelê kurd siwar in, dê piştî demekê peya bibin.

Nifirêن siyâsi

- Tu Kurdistana Azad nebînî.
- Kurê te bibe itîrafçî
- Mêrê te bibe cahş
- Tu bibî dostê Mesûd Barzanî.
- Tu di nav PKK'ê de bibî "unsur"!
- Kurê te negihêje refan.
- Mercedesa Susurlukê li te biqelibe.
- Tu bibî cînarê Mehmet Ağar.
- Tu bikevî destê polîsên tirk
- Doza te ji Komîsyona Mafen Mirovan a Ewrûpayê vegere.
- Şeva Newrozê teker bi dest te nekevin.
- Hûn derkevin kolanan alek bi dest we nekeve.
- Riya gerîla bi mala we nekeve.
- Roja serhildanê tu ji mal dernekevi.
- Agirê leşkeran bi mala we bikeve.



- Rojnameya bêsansûr bi dest te nekeve.
- Kurê te bibe leşkerê Roma Reş.
- Malbata we çekekê li dijmin neteqîne.
- Doğu Perinçek te rizgar bike.

- Mala we mîna çepêñ tirkân bibe cil parce.

Nifirêن medyatîk û hunerî

- Roja panelê ba antena te bibe
- Tu bibî mîvanê Reha Muhtar

- Sadettin Teksoy çavêñ te birijîne.
- Tu bi M. Yılmaz re hevpeyvînê bikî.
- Tu her tim li dublajên MED TV sêr bikî

Nifirêن nav Azadiya Welat

- Tu her tirkmancı bimînî
- Tu Silêmaniye nebînî.
- Soraniya te bi pêş nekeve.
- Peyvîn te netewin, serê te bitewe.
- Tu nivîsên M. Ferho redakte bikî.
- Tu ji dimîlî bêpar bimînî.
- Tu tajî bî, pirtûkên bi kurdî kerguh bin.
- Her çar parçeyêñ welatê te nebin yek.

Nifirêن civakî


- Telefonâ te ya destan çenebe.
- Tu bikevî dora meaşan.
- Tu li nexweşxaneya sîgoitayê tedawî bibî.
- Meytê te li goristana belediyeyê bê veşartin.
- Berçavka te bibe sê derece.
- Tu bibî dijminê kesê ku ev nifî nivîsîne.

RUKNETTÎN KÜNOZ

BI XELAT...

XACEPIRSA BI XELAT (130)

XACEPIRSA




Bersiva Xacepirsa 128'an

Xacepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigîhîjin destê me, em dê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 130'î pirtûka Hüseyin Kaytan 'Levhalar' e.


Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nîrxandin, divê hûn "Peyva Veşarı" di nava qutiyêñ li bin xacepirsê de binivîsin û tevî navmîşana xwe ji me re bişînin.

Pênc kesen ku xelata hejmara 128'an kaseta koma Dengê Azadi 'aşti' qezenc kirine: Zeynel Erdoğan/İzmîr, Mehmet Toprak/Amed, Ferid Demirel/Stenbol, Ferzen Yağız/Mêrdîn, Pelda Adıgüzel/ Amed



hüseyin kaytan



PEYVA VEŞARI

1 2 3 4 5

Dewleta tirkawazena fekûrişiyayina sîstemê pawitoxan vindarno, Awka dola tegayî linciya vindariyena?

Dewleta senî kena nêşena verê fekûrişiyayin bigiro. Her roj cayê ra xebera fekûrişiyayina yena û her roj pawitoxê jew cayê tifing viradenê. Dewleta jî verê fekûrişiyayinê sîstemê pawitoxan girotin qanûno newe kerd hedre. Goreyê nê qanûnî iyê mesayî û operasyonî ser jî perey bidê ci û iyê nê qanûniya zey karmandan bê.

Hemû karê liminê ke Kurdistan de benê û viraziyenê nameyê ïnano (pawitox/cahs/ korucu), te de (mî-yande) ravêreno. Xirxizey (tirten) ra teşpê, hetanî keyna-remnayin, tecawizkerdin, xespkerdin, mardimkişen û zey ninan xeylê karanê liminan de ravêrd û oyo ravêreno.

Kes qandê ïnan şeno wina jî vajo; giliye çimê artêşa tirk. Çimki eke, ê çinêbê artêşa tirk nêşena zey ewroy operasyonî vira zo. Eke virazo jî hetanî cayê virazena û bado mecbûr manena peyser anciyena (ageyrena). Her çiqas ewro vêşiyê artêşa tirk Kurdistan de bivîniyo (biyaso) jî, rastî de artêşa tirk xeribê koyan û herêmê Kurdistanî ya.

Coka şero límino ke 15 seriyo Welatê ma de rameno, rolê nê xorotoxan (Bê êkê mecbûr mendê û biyê pawitoxî) vêşîyo û kes nêşeno, nê rolî nêvînayina bêro û ravêro. Hemû operasyonan de, ray û camûsnayoxê artêşa tirk nê xorotox ê. Nê xorotoxî hemû şeranê (lejanê) reyayinê şaran de vejjienê werte. Nê zewbî şaranê bindestan miyan de jî vînyenê. La belê nameyê ci zewbiyê, pêro jî raya bindestin ra xelisyayin (reyayin) de çalê gîrd û xorî yê û layê azadî tepîstîn de jî gireyê kor ê.

Toximê ninan menga avrêla 1985 de mabenê şaristanê Çeman û Beytüssebap de dewleta tirk û girdanê Aşireta Jirkî çekard (karit). Dewlet a ser gerflayanê Artêşa Reyyayinê Şarê Kurdistan ra darban sero darbey werdin sero zereyê qanûnê 74'ê dewan kerd hera. Ú çosmeyê nê qanûnî de ronayînê (awan kerdinê) caşsan (pawitoxan) kerd eškerâ.

Goreyê vatenan menga gulana 1985 de serdarê artêşa tirk û girdê aşireta Jirkî ra Tahir Adiyaman, Haci Öter, Abubekir Ay-



Cahşê pereyê ke guniya şarî xo rijnatayina qezenc xo kenê mird.

demir û Kökel Özdemir keyeyê muxtarê dewa Aşağıderey Mehmet Dereli de ameyê pêser û qandê cahşîn peyman viraşto. Goreyê nê peymanî êkê nameyê ci cor-de-nûşayê, o çax haq tê ïnan pêren biryare zereyekerdin estbi. Verî no biryaro hewadiyo. Peyra jî Tahir Adiyaman, Haci Öter, Abubekir Aydemir û Kökel Demir, iyê jî Qura-nî sero siwend biwanê, 3'ê sî çekirê û bibe girêdayox û pawitoxê dewleta tirk.

Hem dewlet û hem jî, nê xorotoxan was-tenê nê peymanî ardê ca û rojê didin, helikopteriya şinê Amed û wija Fermandarê

Kolordu Korgeneral Kaya Yozganî ya pêdiyin virazenê o jî, ê peymanî nameyê Artêşa qabûl keno û tifingî dano ci. Tahir Adiyaman û embazê ci nê vera şarî xo lej bikirê û dewleta jî suçanê ïnan verînan ef kiro.

Dewleta tirk o roj ra, no roj yanê menga gulana 1985 ra na kişî kotî jew kurdo xorotox esto ci dest ra tepîst û kerd pawitox û wast fekûrişiyayinê xo, nînana vindarno. Ancî kişa bîn ra, winakerdina wast vera vardayinanê PKK bigiro û tayn kiro û ïnan ra xo rê artêşa rehberin rono. Hemû operasyonan û vardayinan de ïnan xo ver de vazdayno. Çimki xo ne koyan û ne jî herem silasena.

Wastena ke dewleta tirk caşsan ra pawitoxê Wezîrê karê zereyê tirkîye yê o çaxî Yîlidirîm Akbulutî wina ardi ziwan: "Eşkiyayê sinorî ravêrenê û yenê koyan û mixaran de wextê rindi pawenê û firset ke kewt ci dest iyê dewan rê vardayin virazenê û eskeranê ma jî finenê faq. Ancî kişa bîn ra xeylê dewê ci rê zorna bo jî hetkarîn virazenê. Ma qandê vera nê biyayan girotin qanûnê pawitoxin vet. Wexto ke dewan ra hetkarîn mevînê di mengan miyan de peyneyê ci yeno".

Nê vatenanê wezîrê karê zereyê tirkîye-

yê o çaxî ser ra 13'ê serî ravêrdi. Ek kes pawitoxin sero serdarê dewleta tirk kamînî ya qisey bikiro ancî qiseyê ke verdê 13'ê seran vajayayê iyê ïnan fina biyarê ziwan. Dewleta tirk ewro jû kişî ra, çiyê ke verê 13'ê seran caşsan ra pawitê awa hewna ê waste-nan ana ziwan la belê kişa bîn ra ewro sîstemê pawitoxan fekûri şino.

Dewleta senî kena nêşena verê fekûrişiyayin bigiro. Her roj cayê ra xebera fekûrişiyayina yena û roj pawitoxê jew cayê tifing viradenê. Wezîrê karê zereyê tirkîye jî verê fekûrişiyayinê sîstemê pawitoxan girotin qanûno newe kerd hedre. Goreyê nê qanûnê newey iyê mesayî û operasyonî ser jî perey bidê ci û pawitoxê nê qanûniya piya zey karmandan bê.

Bi rastî kes şeno nê qanûnê neweyê wezîrê karê zereyê tirkîye ser wina vajo. Hinînika senî kenê winî bikirê, belki şenê heveyan, heveyne diha kurdan pejewînan finayîn de bixeftinê, la belê nêşenê verê fekûrişiyayin bigirê. Jû vatenan ma ya verînan es-ta ke, tam rastîna qanûno ke wezîrê karê zereyê tirkîye kerdî hedre ana ziwan: "Awka dola tegayî linciya vindariyena?" Çiqas şima dest ra yeno lincî pîradûsnî.

MEMED DREWŞ

Wek Çemê Fırat pêl pêl dîkişim
Bend min ranagirin fireh û boş im



Li ber hemû çewisandinan NCM sala xwe
ya sêyemîn pîroz dike. Em dixwazin vê
roja girîng bi gelê xwe re pîroz bikin.

Dîrok: 26 tîrmeh 1998 yekşem

Saet: 14.00

Navnîşan: Sîlîfe cad. Gökçay Çarşısı A/ blok. Kat.4 Mêrsîn

WELAT
ROJNAMEYA HEFTEYÎ
(Haftalık Gazete)

■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi)
M. NURİ KARAKOYUN
■ Yönetim Yeri
İstiklal cad. Asmali Mescit sok. 35/37 No:308

Beyoğlu/İstanbul
TEL: (0 212)
251 79 37-251 90 13
FAX: 251 95 85

■ Gerînendeyê Giştî yê Weşanê
(Genel Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN
■ Berpîrsê Karên Nivîsaran
(Yazî İşleri Müdürlü)

M. SALİH TAŞKESEN
■ ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
■ Yayın Koordinasyon:
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.

■ BELAVKIRIN
BÝRAY Dağıtım
■ NÜNERÎTİYËN ME
(Temsilciliklerimiz)

■ Mêrsin
Tel: 0 (324) 233 83 96

■ İzmîr
Tel: 0 (232) 425 37 02
Münchén:
(Nünerî Giştî yê Ewrûpayê)
Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815

■ Swîsre:
Ihsan Kurt
Tel-fax
41 21 652 76 07
■ Hollanda:
S. A. Fewzi
31 104 85 55 43
■ Suriye:
Jana Seyda
Helim Yüsiv

Bi zarokên Amedê re li ser tatîlê kurtêhevpeyvîn

“Tatîl ji bo me pir-xebat e”

Ligel şerê çekdarî, psîkolojîk û çewt-hêvotina bi riya dibistanê mecanî jî zarokên welêt, bi taybetî jî yên Amedê, ne dîtewin ne jî ji ser jiya xwe vedigerin. Kulîkîn welêt dibêjin ‘divê em zarokên kurdan ji zarokên cîhanê bêhtir bixebitin, em pirtûkên serhildanê kurdan bixwînin.’

Serê qirêjî ku li Kurdistanê didome xeyalê zarokên Amedê wekî xeyalê mirovên mezîn kirine û zarokên Amedê mîna mirovên 30 salî li jiyanê dînihêrin.

Dibistan ketine tatîlê. Dema behsa tatîlê dibe, rawestin tê bîra mirovan. Lî belê ji bo zarokên Kurdistanê gelo wateya tatîlê ci ye? Dema em li ser wateya tatîlê bi zarokên Amedê re axivîn, me dît ku tatîl ji bo wan zêde tiştekî îfade nake. Tatîla dibistanê ji bo zarokên Amedê xebata zêdetir e.

Em berî ku bi zarokên Amedê re bi axivin bi endamekî Eğitim-Sena Amedê re li ser tatîlê, ji bo zarokên herêmê tatîl ci îfade dike; di tatîlê de dijwariyên çawa li hêviya zarakan in, axivîn. Endamê Eğitim-Senê di axaftina xwe de wiha di got: “Perwerdehî pêvajoya guherandina helwesta şexsan e. Ev guherandin angorî daxwaza çîn (sinif) serdest (egemen) di be. Çîna serdest mirovên çawa dixwaze, wisa zarakan perwerde dike. Lî ev perwerdekirin li erdnîgariya kurdan li ser bingeha nîjadperestiyê tê danîn. Em li ser tatîlê jî dikarin van bibêjin: Tatîl ji bo zarokên Kurdistanê (Amedê) dema xebatê ye. Ü ji hêla aborî ve alîkarikirina malbatê ye. Zarokên kedkaran di wexta tatîlê de dikevin efîra kardîtinê. Dema di-

bistan vekirîbû, zarok rojê danekî dixebeitin, lê ku tatîl bû zarok hemû danê rojê hewcîyê xebatê ne. Li angorî vê rewşê em nikarin bibêjin zarokên kurdan tatîlê dîkin û radiwestin. Ew şerê qirêjî ku li herêmê didome, wî barekî giran xistiye ser milêñ zarakan û zarok wekî mirovên mezîn hewcîyê xebatê ne. Dema ku kar nebîn û nexebitin sala tê bêtedarîk dimînîn, nikarin bêne dibistanê.”

Zarokên Amedê jî li ser tatîl û tatîlê de wê çawa bikin û daxwaza wan ci ye ji me re wiha rave kirin:

‘EZ diwazim di dibistaneke bi zimanê zikmakî de bixwînim’

Yûsiv: “Di dibistana sereke sinifa 3. de me. Dema dibistan bûm tatîl ez hewce me ku kar bibînîm û bixebitim. Bavê min di girtîgehê de ye. Ji bo vê yekê hewcedarê xebatê me. Ez boyaxçîtiyê dikim. Min dixwest, ez di tatîlê de herim deveren dûr bibînîm lê ev imkanen min tune ne. Ez dixwazim di dibistaneke ku bi zimanê me yê zikmakî dersan dide de bixwînim.”

Ciya: “Di dibistana sereke sinifa 5. de me. Dema dibistan vekirîbûn, ez rojê danekî di qesaxaneyê de (soğuk hava deposu) dixebeitim. Ku bû tatîl ez serê sibê heya êvarê di cihê xebatê de dimînim. Ji ber van sedeman tatîl ji bo min xebata zêde ye. Encax ez êvarê bi qasî du saetan li televîziona MED’ê temaşe dikim û hemû tatîla min ev e.”

‘EZ pir bi şens im ku imkanekî min a çûyîna NÇM’ê heye’

Neşe: “Di dibistana sereke de derbasî sinifa 5. bûm. Ez di koma folklorê ya NÇM’ê de dixebeitim ku dibis-

tan tatîl bûye hemû wextê xwe didime xebata tolklorê. Ev tiştekî pir xweş e. Ez pir bi şens im ku imkanekî min a wiha heye. Ez jî zanim ku zarokên hevalê min hemû ne xwediyê imkanen wiha ne. Daxwaza min a herî mezîn min di dibistaneke bi kurdi de bixwenda. Lî fro MED-TV jî bi qasî dibistaneke ye.”


‘Tatîl ji me kurdan re luks e’

Songul: “Ez di dibistana navincî sinifê yekemîn de me. Wateya tatîlê jî bo me zarokên kurdan xebat e. Gelek hevalen min di tatîlê de hewcîyê xebatê ne. Ez di NÇM’ê de koma folklorê de dixebeitim. Gerek em zarokên kurdan ji zarokên cîhanê zêditir bixebitin, ji bo azadiyê pêwîstiya herî mezîn pir xebat e. Ji bo vê sedemê tatîl û rawestandin ji me re dest nade. İro dibistana ez tê de dixwînim perwerdehiya wê hemû li ser nîjadperestiyê ye. Çand û zimanê me û çand û zimanê hemû gelên dinê jî tê înkarkirin. Ji bo ku ev înkarkî û qedexeyî li ser ziman û çanda me bêna rakin gereke em pir bixebitin. Ji ber van sedeman tatîl ji me kurdan re luks e.”

‘Di tatîlê de ezê pirtûkên serhildanê kurdan bixwînim’

Bahûner: “Ez di dibistana navincî de xwendevan im. Tatîl ji bo min zêde xebat divê. Di tatîlê de ez di qehwexaneyê de dixebeitim. Min pir dixwest ez tevî koma folklorê bixebitin lê ev imkanen min tune ye. Di tatîlê de ezê der heqê dîrok û serhildanê Kurdistanê de pirtûkan bixwînim. Rojê, bi qasî du saetan ez wexte xwe ji bo xwendina pirtûkan vediqetînim. Dibistana em zarokên kurdan tê de dixwînim serê sibê bi merşê nîjadperest dest pê dike. Ü êvarê dema belavbûnê dîsa bi van merşan dibistan belav dibe. Wateyeke tatîlê jî ji bo min dûrketina ji van merşen kevnoperest û nîjadperest e.”


Mazlûm: “Min dibistana sereke salak beriya vê qedand. Ez niha li ber desete darraşan dixebeitim. Serê sibê heya êvarê di cihê kar de dimînim. Timî karê me ev e û rewş wiha ye. Rawestandin ji



me re tune ye. Evarî bi qasî çend saetan ez li televîziona MED temaşe dikim. Ji bo min tatîl jî rawestandin jî ev e.”

Hakan: “Ez di dibistana navincî de dixwînim. Dema bû tatîl ez jî wekî hevalen xwe yên din li pey kar im ku bixebit. Lî min kar nedît ku ez bixebit. Vê demê em mecbûr in ku herin metropolen Tirkîyeyê bixebitin. Wateya tatîlê ji bo min ne girîng e. Min dixwest ez di tatîlê de gelekî bigerim. Lî imkanen min ên ku ez vala bigerim tune ne. Di dibistana jî ez kîmasiya tunebûna zimanê xwe yê zikmakî dikişînim. Xwendina van dibistana ji bo min pir cefa ye û tatîl ji bo min ew qas cefa ye.”

Mizgîn: “Min dibistana sereke qedand, sala tê ez ê herim dibistana navîn. Wateya tatîlê ji bo min geleki girîng e. Sedema vê jî ezê di tatîlê de di koma folklorâ NÇM’ê de bixebitin. Ev dibistana vê sistemê ku ez tê de dixwînim dûrî zanyariyê ne. Ji ber van sedeman tatîl ji bo zarokên kurdan ku xwe geş bikin û dûrî vê kevnoperestiyê bikevin, firsendeke baş e. Zarokên law di tatîlê de hewcîyê xebatê ne ku ji hêla aborî ve alîkarîya malbata xwe bikin. Em qîz di vî warî de bi şens in ku di tatîlê de dema me heye. Ev jî nayê vê wateye ku em ê vala bisekinin. Daxwazeke min ji weşanen kurdan ên bi zimanê kurdi dertêne heye ku ew dîroka kurdan û dîroka tevgera azadiyê bi zimanekî vekirî pir bidin.”



Ew di tatîlê de ji bo ku alîkarîya aborî bide malbata xwe mecbûr e ku bixebite. Karê wî boyaxçîtiyê ye. Barê malbata wî li ser pişta wî ne. Çimkî bavê di girtîgehê de ye.